



Husein Muhammed: *Cînavên kurdî*

*Diyarî bo ronahiyên jiyana min,
kurên min Robîn û Robarî*

Nivîserê kitêbê



Husein Muhammed dadnas (hiqûqnas), zimannas û wergêrekî kurd e. Ew sala 1980 li Zaxoyê hatiye dinyayê û ji sala 1994 ve li Fînlandayê dijî.

Husein Muhammed wek birêveberê fêrgeheke ji bo mezinan dixebite. Ew berî niha wek avukat û berî hingê jî wek memûr li Wezaretê Hindir ya Fînlandayê xebitiye.

Husein Muhammed ji sala 1995 ve bi berdewamî bi zimanê kurdî dinivîse û werdigerîne. Heta niha 17 kitêbên bi wergera wî û kitêbek jî bi nivîsîna wî hatine çapkirin. Kitêbên bi wergerandina wî ji weşanxaneyên wek Nûdem, Helwest, Han û Dîwan derketine. Di nav berhemên wî wergerandî de bo nimûne Hafiz, Mewlana, Shakespeare û Çexov hene. Herwiha nivîs û wergerên wî di piraniya kovarên kurmançî de hatine weşandin.

Husein Muhammed bi salan li ser zimannasiyê xebitiye. Niha ew bi çendîn berheman ve mijûl e ku yek wergerandina Qur'anê ye, yek ferhengeke soranî-kurmançî ye, yek kitêbeke dengnasiya kurdî ye û yek jî ferhengeke etîmolojî ya zimanê kurdî ye.

Berê Husein Muhammed edîtorê kovara edebî *Mehnameyê* bû. Niha ew edîtorê kovara zimannasî *Kanîzarê* û birêveberê malpera Zimannas e.

Husein Muhammed zewicî ye û du zarokên wî hene.

Mirov dikare nivîs û wergerên wî di van malperan de bixwî:

<https://zimannas.wordpress.com/>

<http://www.kulturname.com/?s=Husein+Muhammed>

http://nefel.com/kolumnists/kolumnist_index.asp?MemberNr=33

1. MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

Di zimannasî û rêzimanê de, **cînav** (bi inglîzî *pronoun*) ew peyv in ku dikarin cihê navdêran yan jî komikên navdêran. Navê cînavan jî ji vê tê: cî-nav anku cîgirên navan yanî peyvên ku cihên navan/navdêran digirin.

Cînav yek ji komên serekî yê birrên peyvan in (li gel navdêr, lêker, rengdêr û hokeran.) Cînav bi xwe ji çendîn jêrkoman pêk tên:

- **cînavên kesî** (bi inglîzî *personal pronouns*): ez/min, tu/te, em/me, hûn/we, ew/wê, wî, wan
- **cînavê lêveger** (*reflexive pronouns*): xwe
- **cînavên beramberiyê** (*reciprocal pronouns*): hev, hevdu, hevûdin, yekûdu...
- **cînavên nîşander** (*demonstrative pronouns*): ev, ew, vê, vî, van, wan...
- **cînavên pirsyarkî** (*interrogative pronouns*): kî, çi, kîjan...
- **cînavên têkiliyê** (*relative pronouns*): yê ku, ya ku, yên ku...
- **cînavên nediyar** (*indefinite pronouns*): her, ti, hin, ya/yê/yên din...

Di rêzimannasiya kurmançî de çendîn formên peyva cînav hatine bikaranîn: cînav, cînavk, cîhnav, cîhnavk. Forma soranî bi piranî "cênaw" e. Ji bilî van, herwiha peyva "pronav" ji "pro-" ya ewropî (bidin ber "pronom" ya fransî yan "pronoun" ya inglîzî) û "nav" anku "navdêr" ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatibû çêkirin û bikaranîn û heta vê dawiyê jî hin kes bi kar tînin lê xebitandina wê ber bi kêmbûnê ve ye. Herwiha peyva "zemîr" ya erebî (carinan di bin tesîra tirkî de bi forma "zamîr") jî di rêzimannivîsîna kurdî de (bi taybetî di zazakî de) tê emilandin.¹

Di vê vekolîna xwe de em ê ji van peyvan forma "cînav" bi kar bînin hem ji ber ku ew ji yê din kurttir û siviktir e û hem jî bi taybetî ji ber ku li gor lêgerînên me ew di rêzimannivîsîna kurmançî de niha ji formên din zêdetir tê bikaranîn. Bo nimûne, di lêgerînên bi alîkariya Google, mirov dikare bibîne ku "cînav" beramberî van peyvên din di kurdî de serdest e.

Li cihê peyva "kesî" di gotina "cînavên kesî" de ji aliyê hin nivîskarên ve peyvên "kesîn" yan "kesane" jî hatine bikaranîn. Herwiha hin caran peyva erebî "şexs" jî bi heman wateyê tê nivîsîn.

¹ Binêrin bo nimûne: Îbrahîm Seydo Aydoğan: Rêzimanên kurdî û termînolojiya wan ya zimannasî:

<http://www.kurdigeh.com/rwdx/sitepdf/Ib.Seydo-terminoloji.pdf>

Di warê cûreyên cuda-cuda yê cînavan de termînolojiya me hê baş cihê xwe negirtiye bi taybetî jî ji ber ku – ji bilî cînavên kesî –cînavên din yê kurdî kê hatine vekolîn. Yek ji kê kesên ku ew bi piralî li ser parvekirina cînavan rawestiye û hewl daye navên zimannasî jî ji komên cuda yê cînavan re peyda bike, Deham Ebdulfettah e di kitêba xwe “Cînav di Zimanê Kurdî de”.²

Bi qasî ku mimkin be, em ê termînolojiya heyî û cihgirtî bi kar bînin. Eger navê komeke yan diyardeyeke têkilî cînavan cihê xwe negirtibe û çendîn peyvên cuda di nav rêzimannivîsên me de bî bikaranîn, em ê tê bikoşin li gor şertên peyvsazî û watenasî forma maqûl bibijêrin. Eger du yan zêdetir formên baş hebin, em ê ya zêdetir li kar bixebitînin.

Carinan hin peyv hatine çêkirin lê li gor peyvsaziya xwe yan jî watenasiya xwe, bi qenaeta me, ne di cih de ne. Hingê em ê diyar bikin ka ew çima bi kêr nayên û hewl bidin li gor zimanên din, bi taybetî li gor inglîzî, navekî nû jê re çêkin.

2. EV VEKOLÎN Û YÊN BERÎ WÊ

Cînav yek ji birrên serekî yê peyvên in (li gel navdêr, lêker, rengdêr û hokeran). Lom hema-hema di her rêzimannameya kurdî de behsa wan jî tê kirin. Lê dîsa jî bi dîtina me vekolînên têr û tesel hê li ser vê mijara bingehîn nehatine encamdan.

Tek berhema taybet li ser cînavên kurmancî kitêboka “Cînav di kurdî de” ya Deham Ebdulfettah e. Wek din, cînav tenê wek beşek ji rêzimana kurdî, bi kurtî, di kitêbên rêzimanê de ketine ber vekolîn û nivîsînê.

Nivîsîna li ser cînavên kurdî heta niha bi giranî li ser cînavên kesî û mijara çemandina anku tewandina wan rawestiyaye. Cînavên din bi kurtî tên behskirin an jî heta bi temamî tên piştguhaxistin. Ew ne baş hatine rêzkirin, ne sinifandin û ne jî bikaranîna wan ya cuda di ware çemandinê de bûye mijara vekolînên kafî.

Cînavên kesî wek raveker hatine behskirin (bo nimûne “kitêba min”) lê ne wek raveber (bn. “ez ê reben”, “tu yê hêja”).

² Kitêb hem li Dihokê û hem jî li Diyarbekirê hatiye çapkirin. Malpera *Zimannas* ew li ser Internetê belav kiriye:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/05/15/cinav-di-kurdi-de/>

“Vekolînên” li ser cînavan yê heta ji vekolînên zimannasî zêdetir ferzkirinên “filan awa rast e, bêvan şêwe şaş e”. Cînavên devokî nehatine vekolîn – her kesî tenê behsa formên “standard” û “rast” kiriye.

Berhevdana cînavên kurdî/kurmancî di navbera zar û zimanên din de yan kêma in yan qet peyda nabin. Peydabûna cînavên kurdî anku etîmolojîya wan nehatiye vekolîn. Rastnivîsîna cînavan – bi taybetî nivîsîna wan û peyvên din ji hev cuda yan bi hev re (“ez ê biçim” yan “ezê biçim”, “tu yê hêja” yan “tuyê hêja”) nehatine behskirin.

Yek ji mijarên kêma-vekolandî, bi dîtina me, kurtbûn û ketina yan kurtkirin û xistina cînavan e. Herwiha kirpandina cînavên kurdî jî heta niha bi qasî pêwîst bala zimannasên kurd û biyanî nekişandiye ser xwe.

Ev vekolîna me ne ji valahiyê dest pê dike. Me hewl daye hem encamên vekolînên cuda-cuda yê li ser zimanê kurdî bi vê vekolînê bigihînin hev, hem wan di vekolîn û sinifandina wan de vekolînên navneteweyî yê derbarê cînavan³ li ber çavan bigirin û hem jî dîtînen xwe di gelek warên hê di kurdî de venekolandî pêşkêş bikin.

³ Çavkaniya me ya serekî ya navneteweyî *Pronouns* (Cînav) ya D. N. S. Bhat e:

https://books.google.fi/books/about/Pronouns.html?id=-w2H9xRjJCMC&redir_esc=y

3. CUDAHIYA CÎNAVAN JI BIRRÊN DIN YÊN PEYVAN

3.1. Wekheviyên cînav û navdêran

Ji nav birrên din yên peyvan (navdêr, rengdêr, hoker, lêker), cînav bi taybetî dişibin navdêran. Hem navdêr û hem jî cînav:

- dikarin wek biker (kirde, subjekt, fail) bên bikaranîn:
 - o *Heval* dibêjin
 - o *Ew* dibêjin
- dikarin wek berkar (bireser, objekt, mefûl) bên xebitandin:
 - o *hevalan* dibînim
 - o *wan* dibînim
- xwedî formên neçemandî (netewandî) û çemandî (tewandî) ne:
 - o *heval* → *hevalê*, *hevalî*, *hevalan*
 - o *ew* → *(e)wê*, *(e)wî*, *(e)wan*
- xwedî formên yekhejmar û pirhejmar in:
 - o *sêvekê* / *sêvan*, *bajarekî* / *bajaran...*
 - o *wê* / *wan*, *ez* / *em*, *tu* / *hûn...*

Ji xwe – wek ku ji navê cînavan jî diyar e – cînav li cihê navdêran tên bikaranîn:

- *heval* dibêjin → *ew* dibêjin

Herwiha cînav li cihê komikên navdêrî (noun phrases) jî bên bikaranîn. Mebest ji “komika navdêrî” navdêrekî raveber û ravekerên wî ne. Bo nimûne (di nimûneyan de komika navdêrî di nav kevanên kujîdar [...]) de hatiye nivîsîn:

- [bira] hat → ew hat
- [birayê min] hat → ew hat
- [birayê mezin] → ew hat
- [birayê min ê mezin] hat → ew hat
- [birayê min ê mezin yê pir hêja] hat → ew hat

3.2. Cudahiyên cînav û navdêran

Tevî gelek wekhevîyan jî, dîsa cînav û navdêr bi çend awayên giring ji hev cuda ne:

Ji aliyê çemandinê ve navdêr bi piranî li gor heman rêbazê diçemin lê çemîna cînavan bi piranî awarte û istisnayî ye, ne li gor ti qeydên diyar in. Piraniya navdêran li gor mêyîtî, nêrîtî û pirhejmariyên paşgirên “-ê, -î, -an” di halê çemandî de werdigirin:

- sêv (mê) → sêvê, sêvan
- bajar (nêr) → bajarî, bajaran

Lê çemandina cînavan kêr-zêde “keyfî” ye û ne bi ti qeydên giştgir e:

- ez → min
- tu → te
- em → me
- hûn → we
- ew → wê / wî / wan

Lê di çemandina kesê sêyem “ew” de cînav jî di rastiye de dişibin çemîna navdêran. Tarîxiyên formên çemandî yên cînavê “ew” wiha bûn: “ewê, ewî, ewan”. Heta niha jî ew li gelek deveran li kar in lê formên “wê, wî, wan” serî ji wan standiye formên qusandî “wê, wî, wan” niha serdest in. Mirov dikare bi hêsanî bibîne ku varyantên “wê, wî, wan” li gor çemandina navdêran in:

- ew → ewê (bidin ber: sêv → sêvê) → wê
- ew → ewî (bidin ber: şêr → şêrî) → wî
- ew → ewan (bidin ber: gund → gundan) → wan

Ji hêla watenasî ve navdêr binaverok in, naveroka cînavan tenê ji pêşrewa wê diyar dibe. Mebest ji vê ew e ku naveroka navdêrekê ne bi giranî bi hevokê ve girêdayî ye. Bo nimûne, bêyî ti hevokê jî, wek peyveke bi tenê jî em ê kêr-zêde fehm bikin ka mebest ji “sêv” an “heval” çi ye. Lê wate û naveroka cînavan, bo nimûne ya peyva “ew” “vala” ye: bêyî kontekstê, ti tişt ji peyva “ew” nayê fehmkirin.

Naveroka cînavan ji **pêşrew** an *antedenta* (bi inglîzî *antecedent*) wê diyar dibe. Di zimannasiyê de mebest ji *pêşrewê* ew navdêr an komika navdêrî ye ku paşî cînav li cihê wê tê bikaranîn. Bo nimûne:

- *Xox xweş in. Evîndarê wan im. (Xox pêşrew anku antecedent e û wan cînav e.)*
- *Dotmama min a delal helbestvan e. Wê du dîwan dane çapkirin. (Dotmama min a delal pêşrew e û wê jî cînav e ku cihê dotmama min a delal digire.)*

Ji aliyê berfirehbûnê ve navdêr berfirehtirîn anku mezintirîn birra peyvan e lê cînav dikarin wek biçûktirîn an tengtirîn birra peyvan bînin hejmartin. Navdêr herwiha birreke vekirî ne lê cînav birreke girtî ne. Mebesta me ji “vekirî” ew e ku peyvên nû (“endamên nû”) dikarin li komê zêde bibin. Navdêr ji her birra din ya peyvan pêşwazîkertir e anku hêsantir peyvên nû yê çêkirî yan jî ji zimanên din wergirtî qebûl dike.

Mebest ji “cînav birreke girtî ne” jî ew e ku cînav birreke peyvan a wisan in ku qet (yan bi hêsani) peyvên nû lê zêde nabin.

Ji aliyê dîrokî ve cînav xweragir û navdêr veguhêzbar in: Piraniya cînavên kurdî ji zemanê makezimanê proto-hindûewropî heta niha di kurdî de hene. Ne hejmareke mezin ya cînavên nû lê zêde bûye û ne jî jê ketiye.⁴ Berevajî wan, piraniya navdêrên kurdî yê niha ne ji proto-hindûewropî ne anku yan bi nisbî nû hatine çêkirin yan jî bi hin peyvên ji hin zimanên din hatine veguhastin.

Ji aliyê avanî (struktûr) yan dirêjahiya xwe ve cînav bi piranî ji navdêran kurttir in. Piraniya cînavên bingehîn yê kurmancî du- yan sê-herfî ne:

- duherfî: ez, tu / te, ew / wê / wî, em / me, we
- sêherfî: min, hûn, wan

Heta ji hin ji van cînavên sêherfî re jî di zimanê devkî de formên “mi, wa” yê duherfî hene.⁵ Li aliyekî din, di hin devokan de varyantên 4-herfî jî peyda dibin (forma kurmanciya standard di kevanokan de):

- “hewe” (we) di hin devokên kurmanciya rojhilatî de (bo nimûne li Dihokê)

⁴ Ev qeyd û bend ne bêistisna ne. Bo nimûne, cînavê “her” (wek di peyva “herkes”) de ji zimanên îranî derbazî tirkî bûye.

⁵ Li aliyekî din, di soranî de hejmara cînavên sêherfî zêdetir e: ême (em), êwe (hûn). Herwiha di soraniya mukriyanî de li cihê cînavê “to” (tu) yê duherfî forma “eto” heye û li şûna “min” (ez) ya sêherfî jî varyanta “emin” jî li kar e. Wek di hin devokên kurmancî de, di hin devokên soranî de jî “hingo” ya pêncêherfî jî peyda dibe.

- “vêna, vîna, vêya, viya, wêna, wîna, wêya, wiya” (vê, vî, wê, wî) di hin devokên kurmançiya navendî de (wek mînak li Mêrdînê)⁶
- “wana, vana” (wan) di çendîn devokan de⁷

Di hin devokên sinorî yê navbera kurmançî û soranî de li herdu aliyên heta cînavê pêncêrî jî heye: “hingo” ku formeke neçembar ya li cihê “hûn, we” yê kurmançiya standard in.

Herçî navdêr in, ew di kurdî de bi piranî ji sê yan zêdetir denga/herfan pêk tên tevî ku hin navdêrên duherfî peyda dibin.

Hemû cînavên neçemandî û çemandî bi formên xwe yê serdest di kurmançiya nivîskî de yekkîteyî ne (li gor devokan û di soranî de herî zêde dukîteyî). Piraniya navdêrên xwerû yê bingehîn jî di kurdî de yekkîteyî ne lê hemû navdêrên çemandî bi kêmkî dukîteyî ne. Herwiha hemû navdêrên pêkhatî jî dukîteyî yan pirkîteyî ne.

Ji aliyê ravekirinê ve. Pevgirêdana navdêran wek raveber bi navdêr, cînav an rengdêrên ravekerên wan ve di kurdî û piraniya zimanên îranî de diyardeyeke giştî û berbelav e. Di ravek an ravekirina navdêran de peyva serekî li destpêkê ye û ravekera wê an şirovekera wê – ya ku maneyeke taybet didiyê – li pey tê. Bo nimûne:

- sêva Fatê (ne her sêv)
- sêva wê (ne her sêv yan ne sêvên kesên din)
- sêva sor (ne sêvên ji rengên din)

Di nimûneyên me de “sêv” **raveber** e anku dikeve ber ravekirin û şirovekirinê û “Fatê, wê, sor” **raveker** in anku wê rave / şirove dikin: li vê derê xwedîya sêvê yan rengê sêvê diyar dikin.

Wek prensîp, cînav jî di kurdî dikarin bibin raveber:

- ez ê reben
- tu yê hêja
- ew a min
- ew ê sor

⁶ Bi eslê xwe ev ne cînavên xwerû lê yê pêkhatî ne ji gotinên “wê-ya han, ew-a han” û hwd.

⁷ Bi eslê xwe “wana, ewana” pirhejmariyên ducarî ne, ji “ew-an-a[n]”. Bo pirhejmariya ducarî di navdêran de, binêrin:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/05/01/pirhejmariya-ducari/>

Lê peyvên ku ravekeriyê re ji cînavên “ez, ew, em, hûn” re dikin di pratîkê de kêma in. Ravek wek prensîp li gel cînavê “ew” (nêr, mê, pirhejmar) zêdetir heye lê di pratîkê de bi taybetî kurmanciya navendî û ya nivîskî hingê cînavê “ew” diavêje û tenê cînavên têkiliyê “(y)ê, (y)a, (y)ên” bi kar tîne:

- ew ê hêja → yê hêja, ê hêja
- ew a sor → ya sor, a sor
- ew ên mezin → yên mezin, ên mezin

Ji hêla berhevdanê ve jî cudahiyên navdêr û cînavan hene. Gelek ji navdêrên kurdî dikarin bêyî ti pêşgir an paşgirên peyvsaz wek rengdêr jî bî bikaranîn û berhevdan. Bo nimûne, “şêr, ker, piling, kûçik” navên hin heywanan in anku ji aliyê birrên peyvan ve navdêr in lê ew di heman demê de dikarin wek rengdêr jî bî bikaranîn:⁸

- şêr: wêrek
- ker: bêaqil

Heman peyv dikarin wek rengdêran bî berhevdan:

- “şêr, şêrtir, şêrtirîn, herî şêr” wek “mezin, mezintir, mezintirîn, herî mezin”.

Lê cînav wiha nayên berhevdan:

- “ez, *eztir, *eztirîn, *herî ez”

⁸ Bo bikaranîna wiha ya navên gelek heywanan, binêrin Kovara Kanîzar, hejmar 5: *Heywan bi mecazî*:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/04/07/heywan-bi-mecazi/>

4. CÎNAVÊN KESÎ

4.1. Cînavên kesî di kurdî de

Mebest ji cînavên kesî ew cînav in ku dikarin cihê navên kesan bigirin.

Cînavên kesî di kurmancî de “ez, tu, em, hûn, ew” û formên wan yê çemandî “min, te, me, we, wê/wî/wan” in. Ev formên serdest yê kurmanciya nivîskî ne. Bo varyantên cuda yê devokî û zaravayên din yê kurdî, li jêrtir binêrin.

Di rêzimanivîsîna kurmancî de gelek caran behsa cudakirina cînavan li gor formên wan yê xwerû/neçemandî (netewandî) û çemandî (tewandî) tê kirin. Lê ev tenê yek ji awayên parvekirina cînavan e. Di kurmancî de cînav (hemû yan hin ji wan) dikarin li gor çend rêbazan bîn parvekirin

- **hejmara rêzimanî:** yekhejmar “ez/min, tu/te, ew/wê/wî” û pirhejmar “em/me, hûn/we, ew/wan”
- **kesê rêzimanî:** kesê yekem (ez), kesê duyem (tu), kesê sêyem (ew)
- **cinsê rêzimanî:** bo nimûne mê “wê” û nêr “wî”

Di kurmancî de du desteyên cînavan hene. Yek ji wan xwerû ye yan neçemandî ye (netewandî ne), yê din jî çemandî ne (tewandî ne). Di tabloya li jêr de em ê formên serdest di kurmanciya nivîskî de wiha ne (bo formên devokî li jêrtir binêrin):

cînav	neçemandî	çemandî
1. yekhejmar	ez	min
2. yekhejmar	tu	te
3. yekhejmar	ew	wê / wî

1. pirhejmar	em	me
2. pirhejmar	hûn	we
3. pirhejmar	ew	wan

Wek ku ji tabloyê diyar e, formên çemandî di hemû cînavan de ji formên neçemandî cuda ne. Di kesên yekem û duyem de yên yekhejmar (1. ez/min 2. tu/te) ji yên pirhejmar (1. em/me 2. hûn/we) cuda ne.

Lê kesê sêyem yê yekhejmar yê neçemandî û kesê sêyem yê pirhejmar yê neçemandî herdu jî wek hev in anku "ew" in. Lê dîsa di halê çemandî de ew jî ji hev cuda ne: yekhejmar "wê/wî", pirhejmar "wan".

4.2. Mane û mebesta cînavên kesî

ez / min

Di zimannasiyê de cînavê "ez / min" bi navê "cînavê yekem yê yekhejmar" tê nasîn. "Ez" cînavê yekem yê yekhejmar yê xwerû yan neçemandî ye û "min" jî cînavê yekem yê yekhejmar yê neçemandî anku netewandî ye.

Ev cînav hingê tîna bikaranîn dema ku qiseker behsa xwe dike:

- Ez kurd im.
- Ez van tiştan dinivîsim.
- Ehmed min nas dike.
- Min got.

Anku qiseker (kesa/ê ku diaxive) û qiseber (kesa/ê ku behsa wî tê kirin) eynî ye û keseke/î bi tenê ye. Ew dikare mêr an jî jin be. Ji bilî di hin çîrokên xeyalî de, ew illeh mirov e (ne heywanek an tiştek e) ji ber ku tenê mirov diaxivin û bi zimanê me behsa xwe dikin.

tu / te

Navê cînavê "tu, te" di zimannasiyê de cînavê duyem yê yekhejmar e. "Tu" cînavê duyem yê yekhejmar yê xwerû anku neçemandî / netewandî ye. "Te" jî cînavê duyem yê yekhejmar yê çemandî yanî tewandî ye.

Ew cînav hingê tê bikaranîn gava ku qiseker behsa guhdarê gotinên xwe dike:

- Tu kurd î.
- Tu van tiştan dinivîsî.
- Ehmed te nas dike.
- Te got.

Kesa/ê qiseber bi xwe guhdara/ê yan xwandevara/ê gotinê ye û keseke/î bi tenê ye. Ew dikare mêr an jî jin be. Bi piranî "tu, te" mirovek e. Lê hem di hin çîrokên xeyalî de û hem jî di hin axiftinên mirovan yê ji heywanên kedî re de, "tu, te" dikare heywanek jî be. "Tu, te" dikare herwiha dikare herwiha Xwedê yan jî xwedawendekî / îlahekî din jî be ku mirov daxwaz û ricayên xwe jê dike. Bo nimûne:

- Xwedêyo, tu xêr bikî.
- Xwedêwo, ez ji te rica dikim ku gunehên min efû bike.

Carinan bi merema ihtiram û rêzgirtinê ev cînav di nava hevokê de jî (ne tenê li destpêka hevokê) bi T-ya gir tê nivîsîn. Bi taybetî gava ku mebest jê Xwedê ye, wisa tê kirin. Lê gelek caran di nameyan de ji kesên qedirgirtî yan hêjadîtî jî wisa tê bikaranîn. Vê dawiyê bi vê mebestê, gelek caran li cihê cînavê "tu, te", cînavê "hûn, we" tê xebitandin (li jêtir binêrin).

em / me

Navê cînavê "em, me" di zimannasiyê de "cînavê yekem yê pirhejmar" e. Bi gotineke din, ew formên pirhejmar yê cînavê "ez, min" in.

"Em" cînavê yekem yê pirhejmar yê xwerû yan neçemandî ye û "me" jî cînavê yekem yê pirhejmar yê neçemandî anku netewandî ye. Cudahiya cinsê rêzimanî di vî cînavî de jî peyda nabe. Anku "em, me" dikarin hemû jin bin, hemû mêr bin an jî hinek jê jin û hinek jî mêr bin.

Cînavê "em, me" hingê tê gava ku mexseda qiseker yek ji van komên mirovan be:

- qisekerek û guhdarek (em = ez û tu)

- qisekerek û çend guhdar (em = ez û hûn)
- çend qiseker û çend guhdar (em = em û hûn)
- çend qiseker û guhdarek (em = em û tu)
- qiseker û yek an çend kesên din yên wek qisekerê/î lê ne guhdar (em = ez û ew)

Carinan cînavê "em" bi maneya qiseker an nivîser tenê jî tê bikaranîn. Ew carinan bi mebesta mezinahiya xwe qisekerî/qisekerê lê carinan jî bi merema nefsbîçûkiya qisekerê/î tê xebitandin:

- Xwedê di Qur'anê de bi piranî cînavê "Em, Me" bi kar tîne gava ku mebest jê Xwedê bi tenê ye. Gelek caran paşa û şabanû jî heman formê diemilînin. Ev awa bi mebesta mezinahî û ezametê ye.
- Qiseker û nivîser gelek caran cînavên "em, me" dibêjin an dinivîsin tevî ku mebesta wan kesek bi tenê ye jî: "di vê vekolîna me de" (tevî ku nivîser kesek bi tenê be jî). Ev bikaranîn bi qesta nefsbîçûkiyê ye û bi merema rêgirtina li ber xwemezinkirinê yan xwedanpêşiyê ye ji ber ku hingê cînavên "ez, min" nayên bikaranîn.

hûn / we

Cînavê "hûn, we" di zimannasiyê de bi navê "cînavê duyem yê pirhejmar tê nasîn. Bi gotineke din, ew formên pirhejmar yên cînavê "tu, te" ne.

"Hûn" cînavê duyem yê pirhejmar yê xwerû yan neçemandî ye û "we" jî cînavê duyem yê pirhejmar yê neçemandî anku netewandî ye. Cudahiya cinsê rêzimanî di vî cînavî de jî peyda nabe. Anku "hûn, we" dikarin hemû jin bin, hemû mêr bin an jî hinek jê jin û hinek jî mêr bin.

Hejmara kesên ku bi cînavên "hûn, we" tên behskirin an gazîkirin, dikarin du yan zêdetir bin. Mîmkin e ku hemû hazir û guhdar bin yan jî wergirên heman peyamê bin. Lê herwiha gengaz e ku tenê yek yan jî tenê hinek ji wan kesan guhdar an wergirên peyamê bin lê mebesta "hûn, we" herwiha kesên din jî yên wek wan bin.

Cînavê "hûn, we" vê dawiyê li ber modela hin zimanên ewropî herwiha bi merema ihtiram û qedirgirtinê hingê jî tê bikaranîn ku guhdar an wergirê peyamê tenê kesek be. Ev awayê bikaranînê di kurdî de bi rêjeyî nû ye, van dehsalên dawiyê belav bûye. Hin kes bawer dikin ku ew ji tirkî ye û loma bikaranîna wê di kurdî de rexne dikin. Lê eger kurdî ew vê dawiyê ji tirkî wergirtibe jî, ew usûleke navneteweyî – xaseten rojavayî – ye û tirkî jî ew ji fransî yan jî ji zimanekî din yê ewropî

wergirtiye. Di fransî, almanî û gelek zimanên din de bêhtiramî ye eger mirov ji kesekî ji xwe mezintir yê ne zêde bernas re cînavê "tu, te" bi kar bîne û herdem divê bi cînavê "hûn, we" bîn xîtabkirin. Di inglîzî de ev bûye sebebê wê ku cînavê "thou, thee" (tu, te) bi temamî ji rewacê ketiye û bi mebesta "hûn, we" û "tu, te" jî herdem cînavê "you" tê bikaranîn ku bi eslê xwe tenê maneya "hûn, we" dida. Eger bikaranîna "hûn, we" bi mebesta tenê kesekî di kurdî de nû be jî, êdî cihê xwe digire, li gor modeleke pirzimanî û navneteweyî ye û hewldana rêgirtina li ber wê bikaranînê bêkêr e.

ew / wê, wî, wan

Cînavê "ew" û formên wî yên çemandî "wê, wî, wan" di zimannasiyê de bi navê "cînavê sêyem" tên nasîn. "Ew" cînavê sêyem yê xwerû anku neçemandî ye, formên "wê, wî, wan" jî cînavên sêyem yên çemandî ne.

"Ew" û formên wî yên çemandî hingê tên bikaranîna gava ku behsa keseke/kesekî ku ji bilî peyamder (kesa/ê ku diaxive yan dinivîse) û peyamwergir (kesa/ê ku axiftinê dibihîze yan peyamê dixwîne) tê kirin. Kesa/ê qiseber anku kesa/ê behsa wê/wî tê kirin dikare bi xwe jî amade û bihîzer (guhdar) be lê ew di axiftinê de ne mixatebê serekî ye anku yekser ji kesekî din re tê axiftin.

Formên çemandî yên cînavê sêyem li gor hejmara rêzimanî û herwiha cinsê rêzimanî tê ferqkirin.

- "wê" cînavê sêyem yê çemandî yê yekhejmar yê mê ye
- "wî" cînavê sêyem yê çemandî yê yekhejmar yê nêr e
- "wan" cînavê sêyem yê çemandî yê pirhejmar e

Anku di halê çemandî de bo jinekê forma "wê", bo mêrekî şiklê "wî" û bo du yan zêdetir kesan jî (mêr bin an jin an jî komeke tevlihev ya jin û mêran) peyva "wan" tê xebitandin:

- wê jinê
- wî mêrî
- wan mirovan

Ev cudahiya cinsî di cînavên "min, te, me, we" de di kurdî de peyda nabe.

Cudahiyêke din jî ya cînavê sêyem ji cînavên yekem û duyem ew e ku cînavê sêyem (anku "ew" û formên wî yên çemandî) ne tenê bi merema mirovan lê herwiha ya heywan û tiştan jî tê emilandin:

- wî berazî, wî xanî
- wê bizinê, wê malê

Cînavê "ew" û formên wî yên çemandî ne tenê cînavên kesî ne lê di heman demê de cînavên nîşander in jî (*li jêrtir binêrin*).

4.3. Cînavên kesî di devokên kurmancî de

Mirov dikare desteya neçemandî ya cînavên kesî yên neçemandî di devokên kurmancî de wiha rêz bike:

standard	ez	tu	ew (yekhejmar)	em	hûn	ew (pirhejmar)
bi nivîskî carinan	wez ⁹	tû, ti	ew	-	hun, hon, win	-
bakurî¹⁰	ez	tu, ti	ew	em	hûn	ew, wana, ewana ¹¹
rojhilatî¹²	ez	tu, tû	ew	em	hûn, hwîn, hîn, hingo	ew
navendî¹³	ez	tu, ti	ew	em	hun, win	ew
rojavayî¹⁴	ez	tu, ti	ew	em	hûn	wana, ewana

⁹ Bi taybetî di stranên gelêrî de.

¹⁰ Li vê derê mebest ji "bakurî" yan "kurmanciya bakurî" devokên Serhedê û derdorên wê ne.

¹¹ Di rastiyê de cînavên "wana, ewana" formên çemandî ne (heta ducarî çemandî jî) lê di van devokan de li cihê forma "ew" ya neçemandî ya kurmanciya giştî tên bikaranîn.

¹² Mebest ji "rojhilatî" yan "kurmanciya rojhilatî" kurmanciya Dihokê, Hekariyan, Urmîyê û derdorên wan e.

¹³ Mexsed ji "navendî" yan "kurmanciya navendî" kurmanciya Mêrdînê, Qamişlo, Şingalê û hin deverên hevsinorên wan e.

¹⁴ Li vê derê qest ji "rojavayî" yan "kurmanciya rojavayî" devokên kurmancî yên Rihayê, Siwêregê, Efrînê û deverên wî alî ne. Herwiha kurmanciya Konyayê û ya Xorasanê jî ser bi vê komê ne.

Desteya cînavên çemandî jî dikarin wiha werin bîn rêzkirin:

standard	min	te	wê (mê), wî (nêr)	me	we	wan
bi nivîskî carinan	mi ¹⁵	-	ewê, ewî	-	-	ewan, wana
bakurî	mi, min	te	ew	me	we	wan, wana, ewan, ewana
rojilatî	min, mi	te	ew	me	hewe, we, hingo	wan, ewan, wa
navendî	min, mi	te	wê, wêya, wêna, wî, wîya, wîna ¹⁶	me	we	wan, wana, ewan, wa
rojawayî	mi, min	te	wê, wî	me	we	wana, ewana

4.4. Cînavên kesî di zarên kurdî de

Di zaravayên kurdî de du pergal û sîstemên cuda yên cînavan hene. Kurmancî û zazakî du desteyên cînavên serbixwe bi kar tînin ku yek jê xwerû yan neçemandî ye û li cihê navdêrên neçemandî digire û desteya din jî çemandî anku tewandî ye û li şûna navdêrên çemandî tê xebitandin. Di soranî, başûrî û hewramî de jî du desteyên cînavan hene: yek serbixwe tê bikaranîn. Desteya bi pey hin birrên din yên peyvan (navdêr, daçek, rengdêr) ve tên girêdan.

¹⁵ Bi taybetî di stranan de yan jî di neqilkirina axiftinê de.

¹⁶ "Wêya, wêna" û "wîna, wîya" di rastiyê de kurtkirinên "wê ya han" û "wî yê han" in lê di kurmançiya navendî de gelek caran hingê jî tên bikaranîn ku devokên din qîma xwe bi "wê, wî" tenê jî tînin. Bo nimûne: "wîna ji mi ra bîne" ("wî ji min re bîne" yan "wî yê han ji min re bîne").

Mirov dikare cînavên zaravayên kurdî wiha rêz bike (tenê formên serdest ji her zaravayî hatine bijartin). Di nimûneyan de formên neçemandî yên kurmancî û zazakî û herwiha formên serbixwe yên soranî, başûrî hewramî berî nîşana | hatine nivîsîn û formên çemandî yên kurmancî û zazakî û formên pêvekirî (girêdayî, zeliqandî) yên soranî, başûrî û hewramî li pey | hatine danîn:

kurmancî	zazakî ¹⁷	soranî	başûrî ¹⁸	hewramî
ez mi(n)	ez mi(n)	min -(i)m	mi(n) -(i)m	min -(i)m
tu te	ti to	to -(i)t	tu -(i)d	to -(i)t
ew wê / wî	a / o aye / ey ¹⁹	ew(e) -î / -y ²⁰	ew(e) -î / -ê ²¹	êd / êde ²² -(i)ş
em me	ma ma	ême -man	îme -(i)man	ême -mã ²³
hûn we	şima şima	êwe -tan	îwe -(i)dan	şima -tã
ew wan	ê înan	ewan -yan	ewane -(i)yan	êdê -şã

Wek ku tê dîtîn, piraniya cînavan di lehceyên me de dişibin hev lê herwiha cudahî jî di navbera wan de hene. Me li jor diyar kir ku di kurmancî û zazakî de herdu desteyên cînavan ji peyvên din cuda tên nivîsîn lê di lehceyên din de desteyek serbixwe û desteya din jî bi birrên din yên peyvan ve tê nivîsîn. Ew girîngtirîn cudahiya cînavan di navbera zaravayên kurdî de ye. Lê çendîn cudahiyên din jî yên girîng hene ku em ê li vê derê rêz bikin:

- 1) Ji aliyê bikaranîne ve cînavên xwerû / neçemandî yên kurmancî û zazakî hevwateriyên cînavên serbixwe yên lehceyên din in lê ji aliyê etîmolojî ve gelek ji cînavên serbixwe yên soranî, başûrî û hewramî hevrehên (lê ne hevwateriyên) cînavên çemandî yên kurmancî û zazakî ne. Bo nimûne: cînavên kurmancî yên çemandî "min, me, we, (e)wan" bi zelalî hevrehên cînavên

¹⁷ Bo cînavên zazakî, binêrin bo nimûne: Roşan Lezgîn *Gramera Kirdkî (Zazakî)* rûpel 68 – 73. Kitêb bi kurmancî ye.

¹⁸ Mebest ji "başûrî" yan "kurdiya başûrî" li vê derê lehceyên feylî, kelhurî, kirmaşanî û deverên nêzîkî wan in ku dikevin navbera deverên soranîxiv û lekîaxiv. Bo cînavan di lehceyên başûrî de, binêrin bo nimûne: Ismail Fattah: *Les dialectes kurdes méridionaux* (Devokên kurdiya başûrî) rûpel 275 – 294. Pirtûk bi zimanê fransî ye.

¹⁹ "a, aye" formên mê ne, "o, ey" nêr in.

²⁰ "-y" li pey vokalan, wek din "î".

²¹ Li gor devokan dikare "-ê" yan jî "-î" be.

²² "êd" nêr e, "êde" mê ye. Formên wan yên çemandî "êdî" (nêr) û "êdê" (mê) ne.

²³ "-ã" anku A-ya bêvilî / pozî (nasal) ku dişibe A+N, bidin ber soranî "-man, -tan, -yan".

serbixwe yê soranî "min, ême, êwe, ewan" in. Ev cînavên soranî di bikaranînê de destebirayên cînavên kurmancî yê xwerû "ez, em, hûn, ew (pirhejmar)" in lê bi şikil û rehên xwe zêdetir nêzîkî "min, me, we, wan" yê hevwateryên "-m, -man, -tan, -yan" yê soranî ne. Lê cînavên kurmancî yê xwerû "tu, ew (yekhejmar)" hem hevreh û hem jî hevwateryên "to, ew" yê soranî ne.

- 2) Ji aliyê diyar(ne)kirina cînavên rêzimanî ve jî cînavên lehceyên kurdî ji hev cuda ne. Di soranî û başûrî de cînavên rêzimanî peyda nabe loma cînavên wan jî bêcîns in. Kurmancî tenê di doxê / halê çemandî de cînavên rêzimanî diyar dike loma cînavê sêyem yê yekhejmar formeke mê ("wê") û formeke nêr ("wî") hene. Lê cînavên din (ez/min, tu/te, em/me, hûn/we, ew/wan) hemû bêcîns in. Di zazakî de cîns hem di doxê xwerû û hem jî di yê çemandî de diyar dibe loma cînavê sêyem yê yekhejmar hem di rewşa xwerû de û hem jî di halê çemandî de xwedî formên cuda yê mê û nêr e. Wek din, di zazakî de jî cînav bêcîns yan ducîns in.²⁴ Hewramî jî di meseleya cînavan de wek zazakî ye.
- 3) Cînavê "ez" tenê di kurmancî û zazakî de hatiye parastin. Ew herwiha ji farisî jî wînda bûye lê di gelek zimanên îranî yê kevn û navîn de diyar e û hevrehên wî di piraniya zimanên hindûewropî de peyda dibin (li jêrtir binêrin).
- 4) Cînavê "hûn" yê kurmancî û "şîma" yê zazakî û hewramî – tevî dûrketina zêde ya ji hev, dîsa jî bi eslê xwe hevreh in. Herdu jî ji îraniya kevn "yûşma-" ne.²⁵ Di hewramî, zazakî, farisî û çend ziman û zarên din yê îranî de beşa dawiyê "şma-" hatiye parastin lê kurmancî Ş avêtiye, Y ya destpêkê kiriye H û M bi N veguhastiye.

4.5. Hevrehên cînavên kesî yê kurdî di zimanên hindûewropî de

Cînavên kurdî – wek cînavên piraniya zimanan – beşek ji peyvên herî kevn ên zimanî ne. Loma hevrehên wan ne tenê di lehceyên kurdî de, lê di zimanên din yê îranî, hindo-îranî û heta hemû malbata zimanî ya hindûewropî de peyda dibin.

²⁴ Roşan Lezgîn di berhema xwe ya behskirî de idia dike ku "ez" di zazakî de herdem mê ye lê bi dîtina min wî ev mesele şaş fehîm kiriye ji ber ku paşgira kesî ya lêkeran ya li gel kesê yekem yê yekhejmar (ez = ez) û kesa sêyem ya yekhejmar ya mê (a = ew mê) di zazakî de eynî ye. Lê cînav bi xwe ne nêr an mê ye, tenê paşgira wî ya lêkerî wek ya mê "-a" ye. Tarîxiyên "-an" bû lê paşî N bi A ve heliyaye.

²⁵ Bidin ber avestayî "yûşmat" û çend formên din: <http://www.languagesgulper.com/eng/Avestan.html>

Husein Muhammed: *Cînavên kurdî*

Li vê derê em ê hewl bidin diyar bikin ka hevrehên cînavên kurdî di hin zimanên din yê ji aliyê malbatî ve nêzîk (zimanên din yê îranî) û yê dûrtir jî (bo nimûne zimanên romî, germenî û slavî) de çawa peyda dibin. Cînavên ku em bidin, ji aliyê dîrokî ve li gel peyva kurdî ji eynî rehê makezimanê

proto-hindûewropî peyda bûne. Lê divê em diyar bikin ku sîstema bikaranîna cînavan di her zimanî de ne mîna hev e û loma ew ne herdem bi temamî hevwateryên hev in.²⁶

Di rêzkirina xwe de em ê ji zimanên ji hêla malbatî ve nêzîktir dest pê bikin û ber bi zimanên dûrtir ve biçin. malik dê vala bin. Ew tê wê maneyê ku hevrehê cînavê kurmançî di wî zimanî de peyda nabe. Ew nayê wê wateyê ku cînavêkî din di wî zimanî de bi maneya cînavê kurmançî peyda nabe lê tenê tê wê wateyê ku ew cînav û yê kurmançî tarîxiyên ne ji eynî rehî peyda bûne. Di nav zimanên kevn de, sebebê valahiya malikê herwiha dikare ew be ku ev cînav di nav nivîsên mayî de peyda nebe û em ji ber hindê nizanin ka hevrehê cînavê kurmançî di wî zimanî de hebû û – eger hebûbe – çi bû.

Ji lehceyên kurdî em ê di tabloyên li jêr de tenê kurmançî bidin ji ber ku me li jortir cînav di lehceyên kurdî de pêşkêş kirine. Ji ber ku "ew" yê yekhejmar û pirhejmar di kurmançî de eynî û ji eynî rehî ne, em ê wî tenê carekê pêşkêş bikin.

kurmançî	ez ²⁷	min	tu, te ²⁸	ew, wê, wî, wan	em, we	hûn, we
farisî	-	men	tû	û	ma	şoma
tacikî ²⁹	-	men	tû	û	mo	şûmo
pehlewî ³⁰	en, ez	men	to	oy	emah	eşmah

²⁶ Bo nimûne, di kurmançî de di dema niha de em dibêjin "ez dikim" û di dema borî ya sade de "min kir" anku cînav ne eynî ye tevî ku biker (kesa/ê ku tiştêkî dike yan kiriye) heman kes e. Bo nimûne, di inglîzî de di van gotinan de herdu caran jî cînavê "I" tê bikaranîn: "I do" (ez dikim) û "I did" (min) kir. Tarîxiyên "I" (bixwînin: "ay") hevrehê "ez" ya kurdî ye anku ji eynî rehî peyda bûye. Lê ji aliyê watenasî ve carinan ew hevwaterya "min" ya kurdî ye.

²⁷ Bo gelek hevrehan binêrin: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/%C3%A9%C7%B5h%E2%82%82>

²⁸ Bo hin hevrehan binêrin: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/túh₂>

²⁹ Bo nimûne: http://polymath.org/tajik_pronouns.php

³⁰ Bo nimûne: <http://www.languagesgulper.com/eng/Avestan.html>

hexamenişi³¹	edem	men-	tuvem	hewv-	emaxem	
avestayî³²	ezim	men-	tûm		ehme-	yûşma-
sanskritî³³	ehem	me, mem	tvem		esman	yûyam, yûşman
ermenî	es		du		menk	-
yûnanî	êgo	mê, êmê	sû		êmêis	-
latînî	ego	me	tû		-	vos
rûsî	ya ³⁴	mnê, mênaya	ti		mi	vi
inglîziya kevn	ic [îk]	me	þu [thu]		-	ēow, īow
inglîziya nû	I [ay]	me, mine, my	thou, thy, the, thine ³⁵	-	-	you
almanî	ich [îh]	mein, mich, mir	du, dich, dir	-	-	euch
fransî	je	me, mon, moi	tu, te, ton	-	-	vous
spanî	yo	me, mí	tú	-	-	vosotros

Wek ku tê dîtin, hevrehên hemû cînavên kesî yên kurmacî di hin yan hemû zimanên hindûewropî de peyda dibin. Herî zêde hevrehên cînavên "min" û "tu/te" berbelav û berçav in. Di rewşa hin cînavên din de, hevreh wisa bi şiklê xwe ji hev dûr ketine ku êdî tenê bi vekolînên dûr û dirêj yên dengnasî û berhevdana zimanên niha û yên kevn mirov dikare bigihe wê qenaetê ku ev cînav bi rastî

³¹ Cînavên hexamenişi anku farisiya kevn dikarin li vê derê bên dîtin:

<http://www.utexas.edu/cola/centers/lrc/eieol/aveol-8-X.html>

³² Binêrin bo nimûne: <http://www.languagesgulper.com/eng/Avestan.html>

³³ https://en.wikipedia.org/wiki/Sanskrit_pronouns_and_determiners

³⁴ Bi bulgarî "az".

³⁵ Êdî kevn bûye û li cihê wê jî "you" (hûn) tê bikaranîn.

carekê ji eynî rehî peyda bûne. Bo nimûne, rewşa cînavên kurmançî "hûn, we" û hevwater û hevrehawê ya farisî "şoma" wisa ye.

Sebebê hebûna hevrehên cînavên kurdî di piraniya zimanên din jî yê hindûewropî de ew e ku cînav komek ji komên herî kevna yê peyvên her zimanî ne. Cînav di her zimanî de peyvên bingehîn in, pir tîr bikaranîn û zû-zû ji bîr nabin û bi bi hêsanî bi peyvên biyanî nayên veguhastin.³⁶

4.6. Hevrehî li gel cînavên zimanên ne-hindûewropî?

Hin cînavên kurdî ne tenê dişibin zimanên xizm û lêzim, wek farisî lê heta şiklê wan wek hin cînavên erebî, azerî û tirkî jî dixuye tevî ku li gor zimannasiya dîrokî, ev ziman ne xizm û lêzim in, ne ji eynî binemala zimanan peyda bûne.

Wek nimûne, mirov dikare cînavê kurdî "min" (bi farisî "men") bide ku pir dişibe "men" (ez) ya azerî û hevrehawê ya tirkî "ben" (dîsa bi maneya "ez").

Ne tenê "min" lê herwiha "ew" (bi zazakî "o", farisî "û") jî dîsa dişibe hevwaterya xwe "o" ya tirkî û azerî. Ew herwiha heta piçekê dişibe hevrehawê ya erebî "huwe" jî.

Cînavê "te" yê kurmançî jî dişibe dawîya cînavê "ente" yê erebî ku maneya "tu, te" dide.

Gelo mesele çî ye? Kurdî ev cînav ji van zimanan wergirtine yan wan ew ji kurdî yan jî ji zimanekî din yê îranî yan hindûewropî birine?

Wek ku me li jortir diyar kiriye, hevrehên cînavên kurdî di piraniya zimanên din yê hindûewropî de jî hene. Anku cînavên kurdî ne ji zimanên cîran hatine wergirtin. Me herwiha diyar kir ku cînav adeten ji zimanên din nayên deynkirin jî.

Anku gelo azerî, erebî yan tirkî ev cînav ji zimanê me wergirtine?

Na, bersiva vê jî neyînî ye. Anku wan zimanan jî ev cînav ji zimanên din nebirine lê peyvên wan yê xwemalî ne. Hevrehên wan di zimanên lêzimî wan de jî peyda dibin. Li gor baweriya serdest ya zimannasî, hebûna hin wekhevîyên wiha tenê tesadîfî ye ji ber ku hemû ziman tenê hejmareke bisinor ya dangan bi kar tînin û loma hem mimkin e û hem jî zerûrî ye ku carinan hin peyvên wan

³⁶ Lê kêman tenê veguhastin. Bo nimûne, cînavê "her" ji zimanên îranî ketiye tirkî û hin zimanên din yê altayî.

yên hevwaterê jî bi şiklê xwe dişibin hev tevî ku mirov dikare bi esehî isbat bike ku wan herdu zimanan ew peyv ji hev wernegirtine.

5. BIKARANÎNA DESTYÊN CUDA YÊN CÎNAVÊN KESÎ

5.1. Bikaranîna destên çemandî û neçemandî

Li jortir me diyar kiriye ku di kurmançî de du destyên cînavan hene: çemandî anku tewandî û neçemandî yanî netewandî. Gelo bikaranîna wan herdu destyan çawa ye? Kengî yê çemandî û kengî jî yê neçemandî tên bikaranîn?

Bersiva hêsan wiha ye: cînavên neçemandî li cihê navdêrên neçemandî û cînavên çemandî jî li şûna navdêrên çemandî tên emilandin.³⁷

Mirov dikare bergeha bikaranîna wan wiha diyar bike:

Bikaranîna cînavên xwerû anku neçemandî (ez, tu, ew, em, hûn):

- Di demên bîn, niha û borî de bikerên (kirde, fail, subjekt) lêkerên negerguhêz (intransîtîv) in anku lêkerên ku nikarin ti berkarên (bireserên, mef'ûl, objekt) yekser wergirin. Bo nimûne: *ez ê biçim, ez diçim, ez çûm. Tu dê bikevî, tu dikevî, tu ketî. Ew ê bîn/werin, ew tên, ew hatin.*
- Di demên bîn û niha de (lê ne di demên borî de) bikerên lêkerên gerguhêz (transîtîv) in anku lêkerên ku dikarin yek an çend berkarên yekser wergirin. Bo nimûne: *em ê sêvan bixin, em sêvan dixwin* (lê *me sêv xwarin* – ne *”*em sêvan xwarin”*).
- Di demên borî de (lê ne di demên bîn an niha de) wek berkara yekser: *Hevalan ew dît* (lê *heval wê/wî dibînin* yan *heval dê wê/wî bibînin* – ne *”*heval ew dibînin”* yan *”*heval dê ew bibînin”*).

Bikaranîna cînavên çemandî anku tewandî (min, te, wê/wî/wan, me, we):

³⁷ Em ê paşî diyar bikin ku herdem ne illeh wisa ye lê wek qeydeke giştî, ev gotin rast e.

- Herdem wek berkarên neyekser li gel daçekan yan jî heta bê daçek jî: *ji min, li te, bi wê re, li gel wan, bo me, wek we, ji ber wî, [keçikê av da] me*³⁸...
- Di demên bîn û niha de wek yekser. Bo nimûne: *wê dibînim, min dibin, wan neêşînin, dê we bixapînin*...
- Di demên borî de wek bikerên lêkerên gerguhêz. Bo nimûne: *me sêv xwarin, wan kar nekir, te çi dît?*

5.2. Wekhevî û cudahiyên bikaranîna desteyên cînav û navdêran

Desteyên çemandî û neçemandî yên cînavên kurmançî jî bi awayekî giştî wek herdu desteyên çemandî û neçemandî yên navdêrên kurmançî ne. Lê hin cudahiyên wan jî ji hev hene ku em ê li jêr rêz bikin.

Di halê xwerû de ji navdêrên kurmançî diyar nabe ka ew yekhejmar an pirhejmar in yan jî ka mê yan jî nêr in. Bo nimûne, peyva "heval" dikare maneya 1) hevalekî tenê bide, 2) çend hevalan bide, 3) hevaleke keç/jin bide yan jî 4) hevalekî kur/mêr bide:

- Heval çû.
- Heval çûn.
- Heval Fatma.
- Heval Hesên.

Diyarbûna hejmar û cinsê peyva "heval" ji beşên din yên tekstê diyar dibe: çû / çûn, Fatma / Hesên.

Di doxê çemandî yan ravekirî de cins û hejmara rêzimanî (yekhejmar yan pirhejmar) berçav dibe:

- Hevalê got / Hevalî got.
- Hevalan got.
- Hevala Fatma.
- Hevalê Hesên.

³⁸ Di nimûneya "[keçikê av da] me" de cînav çemandî ye tevî ku daçek tê de nîne. Ew dikare were daçekkirin, bo nimûne bi awayê "keçikê av bi me da" yan "keçikê av ji me re da".

Kurdî³⁹ cinsê rêzimanî tenê di yekhejmariyê de diyar dike. Di rewşa pirhejmar de, cinsê nêr û mê nayê ferqkirin:

- Hevalan got. (Hevalên ku got, dikarin mê bin, nêr bin yan jî hinek ji wan mê û hinek jî jin bin).

Cînavên "ew" yê kurmancî jî wek navdêrên kurmancî dixebite. Cins û hejmara wî ya rêzimanî di halê xwerû de ne diyar e. Wek peyva "heval", cînavê "ew" jî dikare 1) yek be, 2) çend kes bin, 3) jin be yan 4) mêr be:

- Ew çû.
- Ew çûn.
- Ew Fatma.
- Ew Hesên.

Di halê çemandî de sê şiklên wî hene: 1) yekhejmar û mê, 2) yekhejmar û nêr, 3) pirhejmar (nêr yan mê yan herdu jî):

- wê got. (yekhejmar mê)
- wî got. (yekhejmar nêr)
- wan got. (pirhejmar – nêr an mê yan jî herdu di nav hev de)

Cînavên "ez, tu, em, hûn" jî wek navdêran di halê neçemandî de mê yan nêr ji hev cuda nakin. Loma çawa ku peyva "heval" dikare bi mebesta jinekê yan mêrekî were bikaranîn, wisa peyvên "ez, tu, em, hûn" jî dikarin bi mebesta herdu cinsan werin emilandin. Bo nimûne:

- Ez Ehmed im. Ez Fatma me.
- Tu Ehmed î. Tu Fatma yî.
- Em kurr in. Em keç in.
- Hûn kurr in. Hûn keç in.

Lê bi alîkariya raveka mê yan nêr mirov dikare hemû cînavan jî li gor cinsê mexsedkirî diyar bike:

- ez a reben (ez = mê)

³⁹ Ne tenê di kurmancî de lê herwiha di lehceyên din jî yê kurdî de – eger cinsê rêzimanî qet hebe – cins tenê di rewşa yekhejmariyê de tê ferqkirin. Di pirhejmariyê de cudahî di navbera nêr û mêyan de di kurdî de nayê kirin. Lê di hin zimanên din de (bo nimûne almanî, fransî, spanî, peştûyî) de cudakirin di herdu hejmarên rêzimanî de (mê, nêr) peyda dibe.

- ez ê reben (ez = nêr)

Berevajî navdêran – ku di halê çemandî yê yekhejmar de cinsê rêzimanî diyar dikin – cînavên ”min, te, me, we” anku halê halê çemandî yê cînavên ”ez, tu, em, hûn” jî cinsê rêzimanî diyar nake:

- min got. (kesa gotî diyar dikare jin an jî mêr be. Bidin ber ”Ehmedî got. Fatmayê got.)
- te got.
- me got.
- we got.

Di meseleya hejmara rêzimanî (yekhejmar, pirhejmar) de cînavên ”ez, tu, em, hûn” ne wek navdêrên kurmancî ne. Wek ku li jor hat gotin, navdêr di halê xwerû de yekhejmar û pirhejmariyê ji hev ferq nakin. Lê cînav wisa dikin. Pirhejmara cînavê ”ez” cînavê ”em” e. Pirhejmariya cînavê ”tu” jî cînavê ”hûn” e. Di vê meseleyê de ew hem jî navdêran û hem jî cînavê ”ew” cuda ne. Bo nimûne:

Yekhejmar	Pirhejmar
Heval çû.	Heval çûn.
Ew çû.	Ew çûn.
Ez çûm.	Em çûn.
Tu çûyî.	Hûn çûn.

Wek ku tê dîtîn, di neqilbûna ji yekhejmariyê ber bi pirhejmariyê ve de peyvên ”heval, ew” wek xwe dimînin lê cînavê ”ez” dibe ”em” û cînavê ”tu” jî dibe ”hûn”.

Di hin devokên kurmancî de navdêrên nêr di rewşa çemandî de bi forma xwe ya yekhejmar û diyar nayên çemandin:

- Osman got. (li cihê ”Osmanî got” yan ”Osmên got” ya hin devokên din yê kurmancî)
- li welat. (li şûna ”li welatî” yan ”li welêt”)

Lê dîsa di van devokan de jî cînav di vî halî de jî diçeme:

- Osman got → Wî got. (ne ”*ew got”)
- li welat → li wî. (ne ”*li ew”)

Herwiha di kurmancî de gelek navdêrên mê jî yê vokal bi xwe li dawiyê heyî, êdî nayên çemandin:

- li Zaxo, li Qamişlo (li cihê ”li Zaxo-yê, li Qamişlo-yê” – bidin ber ”li Diyarbekir-ê, li Dihok-ê”)

- li Almanyayê, li Fransa (li şûna "li Almanyayê / Fransayê" – bidin ber "li Kurdistanê, li Îranê")
- li ser rê (li cihê "li ser rêyê" – bidin ber "li ser avê")

Lê di vî halê de jî, eger cînavê "ew" cihê van peyvan, divê dîsa jî "ew" biçeme anku forma "wê" were bikaranîn:

- li wê (li Zaxo/Qamişlo/Almanya)
- li ser wê (li ser avê)

6. CÎNAVÊN KESÎ YÊN PÊVEKIRÎ

6.1. Cînavên pêvekirî

Mebest ji cînavên pêvekirî (yan girêdayî) ew cînav in yan pirtikên cînavan in ku bi birrên din yê peyvan ve tên girêdan û cihê cînavên xweser û xwerû digirin. Lê mebest li vê derê ne paşpirtikên kesî yê lêkeran in, wek bo nimûne di kurdî de "dik-im" ku "-im" diyar dike ku kesê dike "ez" im.

Cînavên pêvekirî bi taybetî li gel navdêran li kar in. Bo nimûne, di van herdu zimanan mirov dikare xwedîtiyê bi cînavên pêvekirî diyar bike. Beşa qelewkirî ya van peyvên nimûne maneya "**a te**" (kitaba **te**) dide:

- erebî: kitab**ek**
- tirkî: kitab**ın**

Heman awayê cînavên pêvekirî yê cînavên din jî di van zimanan de hene. Bo nimûne, bi tirkî:

- kitab**ım** (kitêba **min**)
- (onun) kitabı (kitêba **wê/wî**)
- kitab**ımız** (kitêba **me**)
- kitab**ınız** (kitêba **we**)
- (onların) kitabı (kitêba **wan**)

Berevajî van zimanan, di kurmançî de bi zerûrî cînav xweser û ji peyva serekî cuda tên nivîsîn. Di zazakî de jî rewş wek kurmançî ye. Bi heman awayî di inglîzî de jî cînavên pêvekirî nînin.

Lê di rastiyê de cînavên pêvekirî ne tenê xusûsiyeteke tirkî û erebî ye. Di zimanên îranî de jî bikaranîna wan berbelav e. Bo nimûne, bi farisî

- **kitabem** (kitêba min)
- **kitabet** (kitêba te)
- **kitabîş** (kitêba wê/wî)
- **kitabiman** (kitêba me)
- **kitabitan** (kitêba we)
- **kitabîşan** (kitêba wan)

Bi heman awayî, mirov dikare nimûneyan ji hin zimanên din jî yên îranî bide.⁴⁰

Kurdî bi xwe jî ne bi temamî ji van cînavên pêvekirî bêpar e. Di kurdiya navendî (soranî) û kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de ev cînav bi berfirehî tên bikaranîn. Bo nimûne, bi soranî:

- **serim** (serê min)
- **serit** (serê te)
- **serî** (serê wê/wî)
- **serman** (serên man)
- **sertan** (serên we)
- **seryan** (serên wan)

Heman nimûne bi kurdiya başûrî jî:

- **serim** (serê min)
- **serid**⁴¹ (serê te)
- **serî** (serê wê/wî⁴²)
- **serman** (serên man)
- **serdan**⁴³ (serên we)
- **seryan** (serên wan)

⁴⁰ Bo cînavên pêvekirî di zimanên îranî yên rojavayî de, binêrin bo nimûne: Agnes Korn *Western Iranian Pronominal Clitics*: https://www.academia.edu/849659/Western_Iranian_Pronominal_Clitics

⁴¹ Di çend devokên kurdiya başûrî de jî li cihê “-id” forma “-it” (serit) heye.

⁴² Di soranî de cinsê rêzimanî peyda nabe loma “serê wê” û “serê wî” herdu jî “serî” ne.

⁴³ Di hin devokan de wek soranî “-tan” e: “sertan”.

Sîstema cînavan di kurmancî û zazakî de ji vê pergalê cuda ye. Di kurmancî û zazakî de du desteyên cînavên kesî yên serbixwe hene ku yek jê “xwerû” yan neçemandî (netewandî) ye û yek jî “oblîk” anku çemandî (tewandî) ye (*li jor binêrin*).

Di soranî, kurdiya başûrî, farisî û zimanên din jî yên îranî de cînavên serbixwe hene. Lê di van ziman û zaravayan de ne du lê yek desteyê cînavên xweser li kar e. Ew beramberî cînavên xwerû / neçemandî yên kurmancî û zazakî ne.

Cînavên serbixwe di soranî û farisî de:

Cînavên serbixwe di farisî û soranî de		
cînav	soranî	farisî
1. yekhejmar	min	men
2. yekhejmar	to	tû
3. yekhejmar	ew	û
1. pirhejmar	ême	ma
2. pirhejmar	êwe	şoma
3. pirhejmar	ewan	anan, anha, îşan

Li cihê cînavên çemandî yên kurmancî û zazakî, di ziman û zaravayên din yên îranî de cînavên pêvekîrî li kar in.

Bo nimûne, bikaranîn cînavên neçemandî yên kurmancî li gel cînavên serbixwe di soranî de:

kurmancî	soranî
ez kurd im	min kurd im
tu nivîskar î	to nûser î(t)
ew kar dike	ew kar deka

em hatin	ême hatîn
hûn nebûn	êwe nebûn
ew çi dikin?	ewan çi deken?

Lê gava ku di kurmançî de cînavên çemandî tên bikaranîn, di soranî de li cihê wan cînavên pêvekirî tên xebitandin:

kurmançî	soranî
min got	wut-im
destê te	dest-it
babê wê/wî	bawk-î
dayika me	dayik-man
mala we	mal-tan, mal-eke-tan
çavên wan	çaw-yan

Di soranî de, cînavên pêvekirî ne herdem li dawiya peyvê ne lê gelek dikevin berî rehê lêkerê lê piştî pêşpirtikên din:

kurmançî	soranî
te dibînim	de- t -bînim
min bibîne	bim bî ne
wê/wî bide	bi- y -de / b- î -de
me bibin	bi- man -ben
we dibim	de- tan -bem
wan nekujin	ne- yan -kujin

Ji aliyê rêzimanê ve, hebûna cînavên pêvekirî di soranî de û peydanebûna wan di kurmançî de belkî mezintirîn û diwartirîn cudahiya navbera van herdu lehceyên serekî yên kurdî ye ku têgihîştina ji hev zehmet dike.

Lê gelo bi rastî cînavên pêvekirî di kurmançî de peyda nabin?

6.2. Cînavên pêvekirî di kurmancî de

Ji lêkolînên D. N. MacKenzie ve⁴⁴ di nav zimannasên biyanî de tê dubarekirin⁴⁵ ku di kurmancî de cînavên pêvekirî peyda nabin. Heman idia heta vê dawiyê jî serdest e. Bo nimûne, Korn idiaya Windfuhr dubare dike û dibêje “di nav zimanên îranî yê rojavayî de, ti ji cînavên wisa [yên pêvekirî] di sengiserî, zazakî û kurdiya bakurî (=kurmancî) de peyda nabin.”⁴⁶

Rast e ku bergeha cînavên pêvekirî di kurmancî û zazakî de ne wek farisî yan soranî berfireh e. Bo nimûne, di kurmancî yan zazakî de ti cînavên pêvekirî li cihê “-it” ya soranî yan “-et” ya farisî ya bi maneya “te” ya kurmancî peyda nabin. Herwiha li cihê “-man” (me) ya farisî û soranî di kurmancî yan zazakî de ti cînavên pêvekirî nînin. Wek ku li jor hatiye diyarkirin, kurmancî û zazakî li şûna cînavên pêvekirî yê farisî yan soranî, cînavên serbixwe yê çemandî bi kar tînin.

Lê dîsa jî kurmancî ne bi temamî ji cînavên pêvekirî bêpar e.

Rast e ku di kurmancî de ti formên pêvekirî ji cînavê duyem yê yekhejmar (tu, te) yan pirhejmar (hûn, we) re nînin. Herdem ev cînav bi zerûrî serbixwe li kar in.

Herwiha di kurmancî de ti cînavên pêvekirî bo cînavê yekem yê pirhejmar (em, me) jî peyda nabin. Ew jî bi zerûrî bi rêya cînavên serbixwe tînin ifadekirin.

Lê cînavê sêyem yê yekhejmar (ew, wê/wî) û pirhejmar jî (ew, wan) di kurmancî de, ji bilî du desteyên serbixwe (çemandî û neçemandî) herwiha bi formên xwe yê pêvekirî jî li kar in. Ev cînavên pêvekirî dikarin li gel daçekan, lêkeran û navdêran bînin bikaranîn:

6.3. Cînav bi daçekan ve

- **jê** (ji wê/wî/wan)
 - o jê ve (ji wê/wî/wan)
 - o jê re (ji wê/wî/wan re)

⁴⁴ D.N. MacKenzie 1961a *Kurdish Dialect Studies I*. London: Oxford University Press.

⁴⁵ Bo nimûne: Michiel Leezenberg *Gorani Influence on Central Kurdish*: home.hum.uva.nl/oz/leezenberg/GInflCK.rtf

⁴⁶ “Among the Wlr. languages, no such clitics are found in Sangesari, Zazaki, and Northern Kurdish (WINDFUHR 1975: 462). Agnes Korn *Western Iranian Pronominal Clitics*:

https://www.academia.edu/849659/Western_Iranian_Pronominal_Clitics

- jê de (ji wê/wî/wan de)
- **lê** (li wê/wî/wan)
- **pê** (bi wê/wî/wan)
 - pê re (bi wê/wî/wan re)
 - pê ve (ji wê/wî/wan ve)
 - pê de (bi wê/wî/wan de)
- **tê** (di wê/wî/wan)
 - tê de (di wê/wî/wan de)
 - tê re (di wê/wî/wan re)
 - tê ve (di wê/wî/wan ve)

Wek ku tê dîtîn, cînavê sêyem (yekhejmar yan pirhejmar) dikare bi daçekan ve girêdayî be. Lê cînavên yekem û duyem (yekhejmar yan pirhejmar) di kurmancî de nikarin bi daçekan ve bîr girêdan. Anku cînavên pêvekirî di kurmancî de hene lê bo nimûne ji soranî yan farisî bisinortir in.

Bide ber soranî:

- pêm (bi min)
- pêt (bi te)
- pêy (bi wê/wî)
- pêman (bi me)
- pêtan (bi we)
- pêyan (bi wan)

Herwiha cînavê pêvekirî di kurmancî de tenê dikare bi van çar daçekên bingehîn yê li jor rêz kirî ve bê girêdan, ew nikare daçekên din yê li kurdî bigire. Bo nimûne, ew nikare daçeka “bo, ji bo” ya kurmancî bigire. Lê di soranî de dikare wê jî bigire:

- bom (bo min), bot (bo te), boy⁴⁷ (bo wê/wî), boman (bo me), botan (bo we), boyan (bo wan)

6.4. Cînav bi lêkeran ve

⁴⁷ Di kurmancî de jî forma “boy, boyî, ji boy(î)” di hin devokan de heye lê ew tenê varyanteke hevwatera ya “bo” ye, cînav bi wê ve nehatiye girêdan. Lê “boy” ya soranî ji “bo-y” pêk tê ku maneya “bo wî/wê” dide.

Di kurmancî de herwiha mimkin e ku cînav bi lêkerê ve bê girêdan. Dîsa tenê cînavê sêyem (yekhejmar yan pirhejmar) dikare were girêdan:

- hatê (hat wê/wî/wan)
- çûmê (çûm wê/wî/wan)

Wek ku tê dîtîn, girêdana cînavê sêyem jî tenê bi lêkerên wisa ve mimkin e ku liv û hereketa ber bi cihekî yan tiştêkî ve diyar dikin.

6.5. Cînav bi navdêran ve

Di kurmancî de girêdana cînavê sêyem (yekhejmar yan pirhejmar) herwiha bi komeke navdêrên bisinor ve jî mimkin e:

- kevir bi serî ket (bi serê wê/wî/wan)
- derbe li piştê da (li piştê wê/wî/wan)
- ji zikî ve nexweş e (ji zikê xwe ve)

Paşpirtika "î" ya dawîya peyva "serî" yan "ê" ya dawîya peyva "piştê" ne tenê ji ber çemandina ji encama daçekan (bi/li) ne. Di rewşên wiha de "î" dikeve gel peyva "ser" û "zik" di wan devokan de jî ku adeten navdêrên nêr bi paşpirtika "î" naçemînin. Anku "î" û "ê" li vê derê ne (bi tenê) paşpirtikên çemandinê ne lê ew (di heman demê de) cînavên pêvekirî ne (jî) û maneya "wê/wî/wan" didin.

Li gel daçekan û lêkeran, me dît ku "-ê" wek cînavêkî pêvekirî cihê "wê, wî, wan" digire. Ew hem bêcins e (hem li cihê "wî" jî û "wê" jî li kar e) û hem jî bêhejmar e (dikare bi bi maneya "wê/wî" yê hejmar yan jî bi wateya "wan" yê pirhejmar be).

Lê em li gel navdêran dibînin ku carinan cînav bi awayê "î" ye ("saet li destî") û carinan jî wek "ê" ye ("ristika zêrî li gerdenê"). Gelo di nimûne yekem de "î" maneya "wî" û di ya duyem de jî "ê" wateya "wê" dide?

Nexêr, cînavê pêvekirî dîsa jî bêcins e: "saeta li destî" dikare li destê "wê" jî be ank xwediya saetê jin be. Herwiha "ristika li gerdenê" wek prensîp dikare li gerdena "wî" be. Herwiha dîsa jî cînavê pêvekirî bêhejmar e jî: "li destî" dikare maneya "li destên wan" jî bide, "li gerdenê" dişê bi wateya "li gerdenên wan" jî be.

Anku cudahiya cînavî ne li gor cînavî bi xwe (wê, wî, wan) e lê li gor cînsê peyvê ye: "li destî" ji ber ku "dest" nêr e (ne ji ber ku qest jê illeh destê mêrekî ye) û "li gerdenê" ji ber ku "gerden" peyveke mê ye (ne ji ber ku illeh gerdena jinekê ye).

Me li destpêka vê beşê got ku girêdana cînavê sêyem tenê bi komeke bisinor ya navdêran re mimkin e. Gava ku em dibêjin "derbe li piştê da", em jê fehm dikin ku illeh behsa "pišta wê/wî/wan" tê kirin. Lê gava ku em dibêjin "derbe li kitêbê da", em vê illehiyê di peyva "kitêbê" de nabînin. Belkî wî kesî derbe li "kitêba te, kitêba min, kitêba xwe, kitêba we"yan jî kitêbeke bêxwedî yan xwedînediyar jî dabe.

Sebebê vê cudahiye ew e ku "pişt, ser, zik, gerden" hin ji peyvên wisan in ku di zimannasiyê de jê re tê gotin **neguhêzbarî** yan **xwedîtiya neguhêzbar** (bi inglîzî *inalienability* yan *alienable possession*⁴⁸). Navdêrên neguhêzbar navên wan tiştan in ku mirov nikare ji kesekî neqlî kesekî din bike. Bo nimûne, endamên leşê mirovan peyvên wisan in. Mirov nikare "ser, pişt, zik, sîng"ê xwe bide kesekî din anku ji wan re raguhêze yan neqil bike. Lê mirov dikare "kitêb, sêv, cil"ên xwe bide kesekî din anku wan ji kesekî din re raguhêze loma peyvên wiha guhêzbar in, berevajî "ser, pişt, zik, sîng" ku neguhêzbar in.

Xwedîtiya tiştên guhêzbar ne zerûrî ye: mimkin e ku kesekî kitêb yan sêv tine bin. Lê ne mimkin e yan jî dijwar e ku kesekî ser, zik, pişt, dest... tine bin.

Di rêzimana gelek zimanan de peyvên wiha xwedî hin taybetmendiyan in ku li gel navdêrên din nînin. Di rêzimana kurmancî de cudahî ew e ku cînavê sêyem yê pêvekirî ji navdêrên neguhêzbar diyar dibe lê ji navdêrên guhêzbar xuya nabe.

Di rêzimana kurdiya navendî (soranî) û kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de jî xwe bi awayekî diyar dike. Gava ku mirov behsa tiştêkî xwedîdar ya guhêzbar dike, di van herdu lehceyan de paşpirtika diyarker (li cihê "the" ya inglîzî yan "el" ya erebî) tê bikaranîn, bi forma xwe ya yekhejmar di soranî de "-eke-", di kurdiya başûrî de bi piranî "-ege-", carinan "-eke-":

soranî	başûrî	kurmancî
kitêb-eke-m	kitaw-ege-m	kitêba min
kitêb-eke-t	kitaw-ege-d	kitêba te
kitêb-eke-y	kitaw-ege-y	kitêba wê/wî

⁴⁸ Binêrin: https://en.wikipedia.org/wiki/Inalienable_possession

kitêb-eke-man	kitaw-ege-man	kitêba me
kitêb-eke-tan	kitaw-ege-dan	kitêba we
kitêb-eke-yan	kitaw-ege-yan	kitêba wan

Lê gava ku navdêr neguhêzbar be, bo nimûne endamekî leşî be, hingê “-eke-/e-ge-“ nayê bikaranîn:

soranî	başûrî	kurmancî
ser-im	ser-im	serê min
sik-it	zig-id	zikê te
pişt-î	pişt-î	pišta wê/wî
des(t)-man	des-man	destê(n) me
bawk-tan	bawg-dan	bavê/babê we ⁴⁹
dayk-yan	dalêg-yan	dayika wan

6.6. Cînavê yekem yê pêvekirî

Ji bilî cînavê sêyem, herwiha cînavê yekem yê yekhejmar jî mimkin e ku bi navdêran ve were girêdan:

- cana-m (cana min)
- dilê-m (dilê min)

Ev girêdan tenê bi navdêran ve sinorkirî ye, berevajî cînavê sêyem, ew li gel birrên din yê peyvan (daçekan yan lêkeran) nayê girêdan. Herwiha tenê cînavê yekem yê yekhejmar (min) dikare were pêvekirin, ne cînavê yekem yê pirhejmar (me). Berevajî vê, cînavê sêyem hem yekhejmar (wê, wî) û hem jî pirhejmar (wan) dikare bê girêdan.

Herwiha girêdana cînavê yekem di kurmancî de tenê devkî yan helbestkî ye. Di zimanê nivîskî de ew hema-hema nayê bikaranîn û li cihê wî cînavê serbixwe “min” serdest e. Berevajî wî, girêdana cînavê sêyem hem devkî û hem jî xaseten nivîskî ye.

⁴⁹ Çunkî bi zerûrî her kesî babek/bavek heye yan hebûye.

Ji aliyê tarîxî ve, tê texmînkirin ku cînavên pêvekirî kevn in û cînavên serbixwe yê çemandî dikare nûyîtiyeke (înovasyon, *innovation*) kurmancî û zazakî be.⁵⁰ Lê di meseleya cînavê yekem yê yekhejmar yê pêvekirî de, ihtimalen berevaniya vê rast e: cînavê pêvekî (-m) di kurmancî de tenê kurtkirina "min" e. Ihtimalen lê ne bi eshî ew ji tesîra tirkî yan jî soranî be lê dikare nûyîtiyeke xwemalî jî be.

7. CÎNAVÊ LÊVEGER "XWE"

7.1. Xwe: varyant û hevrehên wî

Mebest ji cînavê lêveger anku refleksîv (*reflexive pronoun*) ew cînav e ku diyar dike ku biker (fail, *subject*) û berkar (me'ûl, *object*) eynî kes in:

- ez xwe dişom.
- Wî xwe kuşt.

Di kurmanciya nivîskî de ev cînav "xwe" ye. Di devokên kurmancî de ew dikare bi van forman peyda bibe (di malikên aliyê rastê de deverên bikaranîna wan (bi awayekî giştî, dikarin li hin deverên din jî wisa bin yan li wan deveran jî li hin deran bi awayekî din jî be):

Awayê gotinê	deverên bikaranîne
xwe	navendî, bakur-rojhilatî
xo	rojhilatî
xu, xwi	rojvayî
xwa, xa	bakur-rojavayî
xe	zimanê zarokan an zarokane

Di kurmancî de ev cînav bêcins, bêhejmar û bêtewang e anku di her hal, hejmar û cinsî de eynî ye:

⁵⁰ Bo nimûne: Michiel Leezenberg *Gorani Influence on Central Kurdish*: home.hum.uva.nl/oz/leezenberg/GInflCK.rtf

- Wî xwe şûşt / Wê xwe şûşt (nêr û mê)
- Ew xwe di awêneyê re dibîne / Ew xwe di awêneyê re dibînin. (yekhejmar û pirhejmar)
- Ew bi xwe / Wî bi xwe (neçemandî û çemandî)

Di lehceyên din jî yên kurdî de hevreh û hevwateryên vî cînavî wiha ne:

- soranî: xo
- kurdiya başûrî: xue, xüe
- zazakî: xo, xwu
- hewramî: wê⁵¹

Cînavê “xwe” jî pir kevna e û hevrehên wî ne tenê di hemû lehceyên kurdî de, lê herwiha di zimanên din yên îranî de û herwiha di gelek zimanên din jî yên hindûewropî de peyda dibin. Li vê derê em ê tenê hin nimûneyan pêşkêş bikin.⁵²

kurdî	xwe, xo, xu...
pehlewî	xwed
farisî	xod
avestayî	xweðete-
sanskritî	svedha, sve-
rûsî	svoy
latînî	suus, suesco, se
fransî	soi, son, se, sa
swêdî, danmarkî	sig, sin
almanî	sich, sein

Maneya piraniya van peyvan jî “xwe” ye lê ya hinan jî “ya/yê wê/wî” ye, bo nimûne “son” ya fransî yan “sin” ya swêdî.

⁵¹ Bo ketina X ji berî W di komdengên XW de, bidin ber kurmancî “xweş, xwarin, xwandin”, zazakî “weş, werdene, wendene”.

⁵² Bo listeyeke dirêjtir, binêrin bo nimûne: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/sw%C3%A9>

7.2. Bergehên bikaranîna cînavê “xwe”

Di kurdî de “xwe” ne tenê hingê tê bikaranîn ku biker û berkar eynî bin. Mirov dikare sê bikaranînên cuda yên cînavê “xwe” di kurmanciya giştî de bibîne:

- Gava ku biker û berkar eynî bin:
 - “Wî xwe kuşt” (Kujer û kuştî eynî kes e).
Bidin ber:
 - “Wî ew kuşt” (kujer û kuştî du kesên ji hev cuda ne).
- Gava ku tiştek yê bikerê/î be:
 - “Nanê xwe xwar” (xwedyê nanî û bixwerê nanî eynî kes in).
Bidin ber
 - “Nanê wî xwar” (xwedyê nanî û bixwerê nanî du kesên ji hev cuda ne).
- Bi mebesta xurtkirina bikerî:
 - “Ew bi xwe hat.” (Ew hat, ne ti kesekî din, ne nûnerekî wî)

Ji bilî van, di hin devokên kurmançî de (xaseten di kurmanciya rojavayî de) bikaranîneke din jî ya cînavê xwe heye. Ew li wî cihê jî tê xebitandin ku kurmanciya giştî adeten cînavê “wî” yan “wê” diemilîne:

- “Navê xwe Hesên e.” (Standard: Navê wî Hesên e.)
- “Navê birayê xwe Hesên e.” (Standard: Navê birayê wê Hesên e.)

7.3. Cudahiyên bikaranîna cînavê lêveger di zarên kurdî de

Di hemû lehceyên kurdî de cînavê lêveger (bi kurmanciya standard “xwe”) bêcins, bêhejmar û bêtewang e. Di kurmançî û zazakî de ew xwerû tê bikaranîn lê di soranî, başûrî û hewramî de ew hewceyî cînavê pêvekirî ye. Kerem bikin em li çend nimûneyên soranî binêrin:

- xo-m (ez xwe; min xwe):
 - xom deşom (ez xwe dişom), xom şûşt (min xwe şûşt)
- xo-t (tu xwe; te xwe)
 - xot deşoy (tu xwe dişoyî), xot şûşt (te xwe şûşt)

- xo-y (ew xwe; wê xwe)
 - o xoy deşo (ew xwe dişo), xoy şûşt (wê/wî xwe şûşt)
- xo-man (em xwe; me xwe)
 - o xoman deşoyn (em xwe dişon), xoman şûşt (me xwe şûşt)
- xo-tan (hûn xwe; we xwe)
 - o xotan deşon (hûn xwe dişon), xotan şûşt (we xwe şûşt)
- xoyan (ew xwe; wan xwe)
 - o xoyan deşon (ew xwe dişon), xoyan şûşt (wan xwe şûşt)

8. CÎNAVÊN BERAMBERIYÊ

Di zimannasiyê de mebest ji cînavên ji cînavên beramberiyê (*reciprocal pronoun*) ew cînav in ku diyar dîkin ku du kes yan du kom hem biker in û hem jî berkar in. Yek tiştêkî li yê din dike û yê din jî heman tiştî li wî dike. Bo nimûne:

- Hesên û Ehmed hev dinasin.

Eslê mebesta vê hevokê wiha ye:

- Hesên Ehmedî dinase û Ehmed jî Hesênî dinase.

Lê bo kurtkirinê û rêgirtina li ber dubarekirina peyvên, bi alîkariya cînavê “hev” hevok hatiye kurtkirin û wek “Hesên û Ehmed hev dinasin” hatiye dariştin.

Di kurmancî de du desteyên cînavên beramberiyê peyda dibin ku ji her yekê jî çend varyant hene. Devokên navendî, bakurî û rojavayî peyva “hev” wek bingeh digirin û yek ji van awayan bi kar tînin:

- **hev**, hevdu⁵³, hevûdu, hevûdin, hevdin

Ev peyv hevreha peyvên “hem, heman, hemî, hemû” ye û eslê peyvê maneya “eynî” dide. Anku du kes eynî tiştî li hev dîkin loma ew beramberî ye û ji vî cînavî re “cînavê beramberiyê” tê gotin.⁵⁴

⁵³ Carinan bi şiklê “hevdu” jî tê nivîsîn.

⁵⁴ Bo zêdetir li ser etîmolojiya vê peyvê, binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/hev>

Cînavê “hev” û varyantên wî yên li jor rêzkirî di kurmanciya nivîskî de jî berbelav û serdest in. Lê ne kurmanciya rojhilatî û ne jî zarên din yên kurdî wê yan hevrehên wê wek cînavê beramberiyê naxebitînin.

Di devokên kurmanciya rojhilatî⁵⁵ de li cihê cînavê “hev”, peyva **êkûdu** wek cînavê beramberiyê tê bikaranîn. Ew dikare herwiha bi şiklê “êkdu, êkdî, yekûdu, yekdu, yêkûdu, yêkdu, êkûdû” û hwd. jî peyda bibe:

- Hesên û Ehmed êkûdu nas dikin.

Peyva “êkûdu” ji herdu hejmarên “yek” (bi kurmanciya rojhilatî “êk”) û “du” peyda bûye. Anku kesek tiştêkî li kesekî dike û kesa/ê duyem jî eynî tiştî li kesa/ê yekem dike.

Hin caran “êkûdu” tê kurtkirin û tenê “êk” yan “yek” dimîne:

- Ehmed û Hesên êk nas dikin.

Bikaranîna “êkûdu” wek cînavê beramberiyê dikare ji kurmancîaxivên deverên din re xerîb û ecêb be lê di rastiyê de qalibekî bi heman awayî di lehceyên din jî yên kurdî de li kar e:⁵⁶

Di zazakî de cînavê beramberiyê *yewbîn* e ku ji peyvên “yew” (yek) û “bîn” (din / dî, ya/yê/yên din/dî) pêk hatiye. Di zazakiya bakurî (dêrsimî) de ew bi şiklê “zûvîni” ye, ji peyvên “zû/jû” (yek) ya zazakiya bakurî û “bîn” ku li nava peyvê bûye “vîn” (bidin ber hin devokên kurmancî: xirabî → xiravî, kebab → kivav).

Di soranî de cînavê beramberiyê li gor devokan dikare *yekdî* yan *yektir* be ku ew jî ji peyvên “yek” û “dî / tir” (din / dî, ya/yê/yên din/dî) pêk hatiye. *Yektir* yan *yektirî*, *yektirekî* di devokên kurdiya başûrî de jî li kar in.

⁵⁵ Mebest ji “kurmanciya rojhilatî” devokên kurmancî yên Behdînan, Hekariyan, Êrmiyê û wan derdoran in.

⁵⁶ Qalibekî nêzîkî wan cînavê beramberiyê yê tirkî jî pêk tîne: “birbirini, birbirine, birbirinin...” ku ji peyva “bir” (yek) ya dubarekirî pêk tê.

9. CÎNAVÊN NÎŞANDER

9.1. Cînavên “ev” û “ew”

Mebest ji **cînavên nîşander** yan *cînavên nîşandanê* (demonstrative pronouns) ew cînav in ku pê tişt yan kes tên nîşandan û îşaretkirin. Di kurmancî de cînavên nîşa_nder yê nîşandana serekî **ev** û **ew** û formên wan yê çemandî ne. “Ev” bo nîşandana tiştên nêzîkî qisekerî û “ew” jî bo tiştên ji qisekerî dûrtir tê bikaranîn.

“Ev” û “ew” bi formên xwe yê çemandî wiha ne:

cînavên nîşander	xwerû	çemandî mê	çemandî nêr	çemandî pirhejmar
nêzîk	ev	vê	vî	van
dûr	ew	wê	wî	wan

Li gor devokan, çendîn formên cuda ji her cînavêkî nîşander yê çemandî peyda dibe:

standard, serdest	formên din
vê	evê, vêya, evêya, viya, vêna
vî	evî, viya, eviya, vîna
van	evan, vana, va, evana, evanan
wê	ewê, wêya, wêna, wiya
wî	ewî, wiya, wîna, ewîya
wan	wa, ewan, wana, ewana, ewanan

Formên serdest ji “ev” yan “ew” + paşgirên çemandinê “-ê” (mê), “-î” (nêr) û “-an” (pirhejmar) peyda bûne lê paşî “e” ji destpêka wan ketiye:

- ev + ê → evê → vê
- ev + î → evî → vî
- ev + an → evan → van
- ew + ê → ewê → wê
- ew + î → ewî → wî

- ew + an → ewan → wan

Formên “va, wa” yên pirhejmar bi ketina N ji dawiya wan peyda bûye – tam wek ku N ji dawiya navdêrên çemandî yên pirhejmar jî di zimanê devkî de dikeve:

- du hevalan → du hevala

Formên “evanan, ewanan” pirhejmariyên ducaî yan dubarekirî ne: ev-an-an, ew-an-an. Şiklên “ewana, evana” û “vana, wana” formên wan yên kurtkirî ne.

Formên “vêna, wêna, vêya, wiya...” kurtkirina “vê ya han, wê ya han, vî yê han, wî yê han” û hwd. peyda bûne. Bo “han”ê li jêrtir binêrin.

Li jor behsa peydabûn û etîmolojiya “ew” li gel cînavên din yên kesî hatiye kirin. Cînavê “ev” di zar û zimanên lêzim de wiha ye:

kurmancî	ev
soranî	em
farisî	im ⁻⁵⁷ , în
hexamenişî	ime-

Pêşgira kurmancî “î-” wek di peyvên “îro, îsal, îşev” de jî ji eynî rehî ye. Herwiha cînavên nîşandanê yên nêzîk yên zazakî “na” (mê), “no” (nêr) û “nê” (pirhejmar) dikarin ji eynî rehî bin û tarîxiyên bi şiklê “în-a, în-o, în-ê” bûbin lê paşî “î-” ji destpêka wan ketibe. Bi alternatîvî, ew dikarin hevrehên “han” ya kurmancî bin (li jêrtir binêrin).

9.2. Cînavê nîşander “han”

Cînavê din jî yên nîşander di kurmancî de heye. Di zimanê nivîskî de ew bi piranî bi şiklê “han” tê dîtîn lê çend varyantên wî yên din jî peyda dibin:

- hanê, ha, he, henê

⁵⁷ Bo nimûne di peyva “imrûz” (îro, evro) de.

Berevajî cînavên “ev, ew”, ev cînav nakeve berî lê pey navdêran. Navdêr bi alîkariya ravekê yan îzafeyê bi “han”ê ve tîr girêdan:

- kitêba **han**, xaniyê **han**, malên **han**

Ravek li gor cînavên navdêrê ye:

- kitêba han (ji ber ku “kitêb” mê ye)
- xaniyê han (çunkî “xanî” nêr e)
- malên han (ji ber ku “mal” li vê derê pirhejmar e)

Tarîxiyên cînavê “han” di wateya cînavê “ev” bû û maneya “ew” wek cînavê nîşander dide. Hevrehê cînavê “han” di farisî de “an” e û niha jî maneya “ew” dide. Heman cînav di zazakî de niha bi awayên “na” (mê), “no” (nêr) û “nê” (pirhejmar) jî dikarin ji eynî rehî bin. Formên zazakî belkî tarîxiyên “an-a, an-o, an-ê” yan jî “în-a, îno, îno-ê” bûbûn lê paşî “a-” yan “î-” ji destpêka wan ketibe. Di zazakî de ew ne maneya “ew” lê wateya “ev” ya kurmancî didin. Bi alternatîvî ew dikarin hevrehên “ev” ya kurmancî bin (li jortir binêrin).

Lê niha cînavê “han” û varyantên wê yê cuda-cuda bi merema îşaretkirin û destnîşankirinê tîr bikaranîn lê – berevajî “ev” û “ew” – “han” nêzîkahî û dûrahiyê ji hev diyar nake. Di rastiyê de ew gelek caran hevdem li gel “ev” yan “ew” tîr xebitandin:

- ev kitêba han
- ew kitêba han

Cînavê “han” bi xwe neçembar e anku naçeme. Xwerû, mê, nêr, yekhejmar, pirhejmar – hemû bi eynî şiklî ne (şikil tenê li gor devokan yan tercîhên kesî diguhere: han, hanê, ha, he, henê). Loma tevî guherîna cînavên “ev” û “ew” jî, “han” bi wan re her wek xwe dimîne:

- ev kitêba han, vê kitêba han, vî xaniyê han, van kitêbên han
- ew mala han, wê mala han, wî birayê han, wan malên han

Cînavê “han” dikare bi navbeynkariya ravekê yekser li gel cînavên “ev” û “ew” re jî were bikaranîn bêyî ku ti navdêr di navbera wan de cih bigirin:

- ev a han, ev ê han, ev ên han
- ew a han, ew ê han, ew ên han

Formên “va, wa” yê yekhejmar yê hin devokan di rastiyê kurtkirinê “ev a han” û “ew a han” in.

9.3. Cînavên nîşander û paşgira –e / -a

Di kurmancî de cînavê “ew” dikare bikeve berî navdêran bêyî ku ti ji herduyan ti zêdehiyekê lê bibe.

Bo nimûne:

- ew kitêb, ew dest, ew herdu mal

Di halê çemandî de hem cînav û hem jî navdêr çemandî ne:

- wê kitêbê, wî destî, wan herdu malan

Cînavê “ev” jî di zimanê nivîskî û di hin devokan de bêyî ti zêdehiyê li gel navdêran tê bikaranîn:

- ev kitêb, ev dest, ev herdu mal

Di hale çemandî de herdu jî diçemin:

Lê di kurmanciya rojhilatî de û di hin devokên din jî yê kurmancî de, bikaranîna cînavê “ev” di hale xwerû de berî navdêrekî, bi zerûrî paşgira “-e” li dawiya wî navdêrî zêde dike:

- ev kitêbe, ev deste, ev herdu male:
 - o Ev kitêbe xweş e, ev deste nazik e, ev herdu male mêvanperwer in.

Di hin devokan de – bi taybetî li hin deverên kurmanciya navendî – li şûna “-e”, paşgira “-a” tê xebitandin:

- ev kitêba, ev desta, ev herdu mala

Di halê çemandî de ev “-e” li navdêran zêde nabe anku di kurmanciya rojhilatî de jî mirov wiha dibêje:

- vê kitêbê, vî destî, van herdu malan

Eger cînavê “ev” bê navdêr were bikaranîna, hingê di kurmanciya rojhilatî de “-e” cînavî bi xwe digire:

- eve:
 - o Eve xweş e.

Bikaranîna vê paşgira “-e” di soranî de ne tenê li gel cînavê “ev” (bi soranî bi forma “em”) lê herwiha li gel cînavê “ew” jî zerûrî ye:

- kitêb → em kitêbe, dest → em deste, mall → em herdû malle:
 - o Em kitêbe xoş e, em deste nask e, em herdû malle mîwanperwer in.
- ew kitêbe, ew deste, ew herdû malle

Eger navdêr li pey cînavî nebin, di soranî de herdu “em, ew” paşgira “-e” werdigirin:

- eme, ewe:
 - o Em xoş e, ewe xoş e.

Hin devokên kurmançî jî yê cîranî soranî (bo nimûne Êrmiyê, Hekariyan, Barzan), paşgira “-e” li gel cînavê “ew” jî bi kar tînin:

- ew kitêbe, ew male, ew deste

Ev paşgira “-e” û varyanta wê ya “-a” bi eslê xwe kurtkirina formên “-a han, -ê han, -ên han” in:

- ev kitêba han → ev kitêbe/kitêba
- ev destê han → ev deste/desta
- ev malên han → ev male/mala

Berevajî “-a han, -ê han, -ên han” – ku cins û hejmarên rêzimanî diyar dikin – paşgira “-e” (yan “-a” ya hin devokan) neutral e û bêcins û bêhejmar e.

Di kurmançî de hem “-a han, -ê han, -ên han” maye û hem jî “-e, -a” di gelek devokan de peyda bûne. Di soranî de “-a han, -ê han, -ên han” winda bûne (yan jî ti caran peyda jî nebûne) lê “-e” ji kurmançî berbelavtir e û di hemû devokên soranî de û di soraniya standard de ne tenê mimkin e lê zerûrî ye.

9.4. Tesîra tirkî: cînav neçemandî û navdêr çemandî

Di kurmançî eger navdêr çemandî be, cînavê diyarker yê pê ve jî çemandî ye:

- ev kitêb → vê kitêbê
- ew dest → wî destî
- ev ser → van seran

Berevajî kurmançî, di tirkî de cînavê pêşdiyarker neçemandî dimîne tevî ku navdêrê pey wî biçeme jî:

- bu kitap (ev kitêb) → bu kitabı (ne “*bunu kitabı”)
- şu el (ew dest) → şu eli (ne “*şunu eli”)
- bu başlar (ev dest – pirhejmar) → bu başları (ne “bunu/bunları başları”)

Carinan mirov ji tesîra vî qalibê tirkî, di nivîs û axiftinên kurmancî de jî awayên wiha dibîne ku tê de cînav neçemandî û navdêr çemandî ne:

- li ev malê
- bi ew kesî re
- ji ev deran

Lê formên wan yên rast yên kurdî wiha ne:

- li vê malê
- bi wî kesî re
- ji van deran

10. CÎNAVÊN PIRSYARKÎ

Mebest ji cînavên pirsyarkî ew peyv in ku mirov pê hevokên pirsyarkî çêdike û pê bikerê (fail) yan jî berkarê (mef'ûl) hevokê dipirse.

Di kurdî de du cînavên pirsyarkî yê bingehîn û xwerû hene. Di kurmancî de ew wiha ne:

- **çi** (li gel varyanta *çî*)
- **kî** (bi forma xwe ya çemandî *kê*)

10.1. Cînavê “çi”

Ji bilî pirsîna mirovan, her tiştê din bi cînavê “çi” tê pirsî:

- Çi ye?
- Çi tişt hatiye kirin?
- Tu çi dibêjî?

Cînavê “çi” neçembar e anku nayê çemandin û tewandin. Forma wê ya xwerû, ya mê, ya nêr û ya pirhejmar hemû “çi” ne:

- çi kitêbê
- çi karî
- çi malan

Lê di rewşa ravekirinê de cins û hejmara rêzimanî diyar dibin:

- çiya te? – kitêba min
- çiyê te? – karê min
- çiyên te? – qelemên min

Forma “çî” jî heye ku li gel forma “çi” di hemû devokan de li kar e. Ew ne formeke çemandî ji cînavê “çi” ye lê hevuate û hev-erka wê ye. Lê forma “çî” zêdetir bi armanca şidandin û xurtkirinê li cihê “çi” tê bikaranîn.

Di kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya latînî de forma “çi” serdest e lê forma “çî” jî yê dîtîn. Di soranî de û herwiha di kurmanciya bi alfabeya erebî de jî forma serdesttir “çî” ye lê forma “çi” jî carinan di nivîsan de tê dîtîn.

10.2. Cînavê “kî”

Bo wergirtina navên kesan yan peyveke ravekera mirovan, di kurmancî de pirs bi cînavê “kî” tê kirin:

- Kî ye?
- Kî hatibûn?
- Te kî dît?

Cînavê “kî” bêcins û bêhejmar e:

- Kî mêr hat?
- Kî jin hat?
- Kî zarok hatin?

Lê di kurmancî de herwiha formeke din jî ya vî cînavî li kar e: “kê”.

Berevajî ku hin caran bi şaşî tê texmînkirin, “kê” ne forma mê ya cînavê “kî” ye. Anku “kî” ne bo nêran (mêran) û “kê” jî ne bo mêyan (jinan) tenê tê bikaranîn.

“Kî” pirsek e ku dikare bi “Ez, tu, ew, em hûn, Jiyan, Hesen” were bersivdan:

- Kî mamoste ye? – Ew mamoste ye.
- Kî dibêje? – Ez dibêjim.
- Kî hatin? – Em hatin
- Kî keça Hesenî ye? – Jiyan keça Hesenî ye.

“Kê” forma çemandî ya cînavê “kî” ye, wek çawa ku “min” forma tewandî ya cînavê “ez” e:

- Kê got? – Min got.
- Kê Hesen dîtiye? – Jiyanê Hesen dîtiye.
- Jiyan keça kê ye? – Jiyan keça Hesenî ye.

Di ravekirinê de “kî” jî dikare bibe mê, nêr yan pirhejmar:

- kiyê te? – kurê min
- kiya te? – keça min
- kiyên te? – keç û kurên min

Di soranî de tenê "kê" heye ji ber ku di soranî de tenê formeke cînavan heye: "min" heye lê "ez" nîne, "to" (hevbera "tu" ya kurmancî) heye lê "te" nîne. Di hin devokên soranî de "kê" wek [çê] tê gotin lê di zimanê nivîskî de herdem wek "kê" (كێ) tê nivîsîn.

Di zazakî de forma serdest bi maneya "kî" ya kurmancî "kam" e. Ew li gor cins û hejmarê diçeme. "Kam" di soranî de jî li kar e lê maneya "kîjan" ya kurmancî dide (*li jêrtir binêrin*).

10.3. "Ku" wek cînavêkî pirsyarkî

Peyva "ku" di kurmancî de bi çendîn erk û wezîfeyên ji hev cuda li kar e. Bi piranî ew wek *girêdera* (konjunksiyon, bi inglîzî *conjunction*) du hevokan tê bikaranîn wek:

- "ez dizanim" + "tu kesekî qenc î" → ez dizanim *ku* tu kesekî qenc î.

Carinan hin kes wê bi awayê "ko" dinivîsin. Di soranî û zazakî de ew bi awayê "ke" serdest e, di farisî de wek "kê" tê bikaranîn. Ew ji zimanên îranî wek "ki" ketiye tirkî jî. Di kurdî de jî carinan forma "kî" jî tê xebitandin, bo nimûne di peyvên "bel-kî, we-kî" de.

"Ku" herwiha carinan wek *hoker* (adverb) li şûna "kû, kî der, kîjan cih" jî hem di hin devokan de û hem jî di nivîsîna hin kesan de tê xebitandin. Lê forma serdest ya bi vê maneyê di zimanê nivîskî de "kû" ye, bi soranî "kwê".

Lê peyva "ku" hem di kurmancî û hem jî di soranî de herwiha wek cînav jî tê bikaranîn. Di kurmancî de bi taybetî li Behdînan û Botan û di soranî de jî xaseten li Hewlêrê, ew dikare carinan cihê "ku" bigire, carinan jî şûna "çawa":

- kurmancî (Behdînan / Botan): Tu ku dibêjî? (Tu çî dibêjî)
- soranî (Hewlêr): To ku yî? (Tu çawa yî?)

Ev bikaranîn hem di kurmancî û hem jî di soranî de ber bi kêmbûnê ve ye û di ti ji herdu zaran de bi nivîskî hema-hema êdî qet nayê bikaranîn. Lê ev bikaranîn gelek kevnar e û bo nimûne Ehmedê Xanî

ew bi berfirehî bi kar aniye. Ew di Mem û Zînê de wiha dinivîse (me ku-yên bi maneya "çi" yan "çawa" **qelew** kirine lê ku-yên girêder *xwehr* kirine):

We zû şemirand ji bo çi sersal
Hûn rast bibên **ku** bûye ehwal?

Hûn bêjine min **ku** bû qediyê?
Kengê li me xef dibit xebiyê

Mecnûn *ku* nebit 'edîlê Leylê
Leylê **ku** dikit bi Leyl meylê?

Go ez **ku** bibêm bike tu bawer
Dawer bi mi ra ku bûye yawer

Em dê **ku** heqîqetê 'eyan kin?
Serrîştêyê tuhmetê beyan kin

Ger fewt bikim cemî'ê ferzan
Tacdîn **ku** didim ji dest xwe erzan?

10.4. Etîmolojîya cînavên pirsyarkî yên xwerû

Ji aliyê tarîxî ve "çi, kî, ku" cînavên pir kevn in, her sê jî ji eynî rehî ne û hema-hema di hemû zimanên hindûewropî de hevrehên wan hene:⁵⁸

kurdî	çi, çî, kî, kê, ku, kam
farisî	çê, çî
pehlewî	çê
avestayî	çiş, ko

⁵⁸ Bo listeyeke dirêj ya hevrehan, binêrin: <https://en.wiktionary.org/wiki/Reconstruction:Proto-Indo-European/k%CA%B7is>

rûsî	что (što), чë (ço), чо (ço), шо (šo)
polonî, çekî	co (bixwîne: ço)
îrlandî	cè, cad
latîni	quis, qui, que
fransî	qui, que
îtalî	cui, chi, che
spanî	que, quien, cuyo
inglîzî	what, who (kî)

10.5. Cînavên “kîjan, kîşk”

Di kurmançiya navendî û ya rojavayî de cînavê “kîjan” de bi wateya “çi ji filan tiştan” yan “kî ji filan kesan” tê bikaranîn. Di zimanê devkî de ew carinan wek “kîja” tê bihîstin.

Di kurmançiya rojhilatî de li cihê wê, forma “kîşk” ya hevwater li kar e. Gava ku ew wek pêşdiyarker were bikaranîn anku li pey wê navdêrek hebe, hingê ew bi forma “kîş” yan “kîj” e anku K pê ve nîne. Bo nimûne:

- kîşk + rojê → kîş rojê, kîj rojê

“Kîjan, kîşk” hevwateriyên soranî “kam”, zazakî “kamcîn, farisî “kodam”, inglîzî “which”, tirkî “hangi”, erebî “eyy” û fransî “quel” in.

Ji aliyê etîmolojî ve adeten tê bawerkirin ku “kîjan” kurtkirina “kî ji wan” be. Hingê “kîj, kîş, kîşk” yê kurmançiya rojhilatî jî dikarin kurtkirinên gotinên “kî jê” bin. Forma “kîşk” dikare bi zêdekirina K ya biçûkker be.

Ji aliyê watenasî ve, ev texmîn beraqil in. Li aliyekî din, gava ku mirov li hevwateriyên wan yê bi zar û zimanên lêzim dinêre, mimkin e ku “kîjan, kîj, kîşk” ne ji “kî ji wan, kî jê” bin lê hevrehên “kamjîn” ya zazakî, “kam” ya soranî û “kodam” (berê “kudam”, bi devkî “kodûm, kûdûm”) ya farisî bin. Bêguman e ku “kam, kamcîn, kodam” her sê hevreh in û formên bi “kam-” kurtkirinên forma “kudam” in. Rehên van digihin heta makezimanê proto-hindûewropî jî. Bidin ber:

- sanskrîtî: katara

- rûsî: kotoriy
- yûnaniya kevn: kotêro → potêro

Bi demê re di zimanên îranî de T bûye D û dawiyê di kurdî D (soranî û zazakî) de bi temamî ketiye (bidin ber kurdî “ba, bûn” û farisî “bad, bûden”).

“Kîjan” û “kîşk” hem wek cînavên serbixwe û hem jî wek pêşdiyarker (predeterminer) tên bikaranîn:

- Te kîjan dît? (cînav)
- Te kîjan kitêb dît? (pêşdiyarker)

“Kîjan” bêhejmar, bêncins û neçembar e. Bo nimûne:

- Tu *kîjan* mêrî dibînî? (bidin ber: Tu *wî* mêrî dibînî.)
- Tu *kîjan* jinê dibînî? (bidin ber: Tu *wê* jinê dibînî.)
- Tu *kîjan* mirovan dibînî? (bidin ber: Tu *wan* mirovan dibînî.)

“Kîşk” jî wek pêşdiyarker (dema ku berî navdêrekî be) be, bêhejmar, bêncins û neçembar e:

- kîşk mêrî, kîşk jinê, kîşk mirovan

Lê wek cînavê serbixwe, “kîşk” – berevajî “kîjan” – bihejmar, bicins û çembar e:

- kîşkê (kî jinê, çi tiştê mê)
- kîşkî (kî mêrî, çi tiştê nêr)
- kîşka[n] (kî mirovan, çi tiştan)

Di bin tesîra kurmanciya rojhilatî de – yan jî ji aliyê qisekerên kurmanciya rojhilatî ve – forma neçembar ya “kîjan” ya kurmanciya navendî jî tê çemandin: “kîjanê, kîjanî”. Bo nimûne:

- “Kurd dê kîjanê hilbijêrin: federalî, konfederalî yan serxwebûn”⁵⁹
- “Kîjanî civak talan nekirine? Kîjanî welat wêran nekirine? Kîjanî nirxên herî pîroz ên mirovahiyê nexistine binê piyê xwe? Kîjanî serî li rêbazên herî qirêj û derveyî exlaq nedaye?”⁶⁰

⁵⁹ <http://krd.sputniknews.com/kurdistan/20160508/2756338/Kurd-de-kijane-hilbijerin-federali-konfederali-yan-serxwebun.html>

⁶⁰ <http://azadiyawelat.site/?p=13243>

- "Wexta kîjanan li qedandinê bû, ji kîjanan re hîn pîr mabû? Di kîjan dosyayan de pêwîstiya lêgerînê tune, di kîjanan de lêgerîn an lêkolînên bi rêk û pêk divêt? Min her carê, li gor lînûska xwe ya danişînê dinirxand."⁶¹

Carinan jî ev çemandin dikare ji ber sebebên hîperkorektiyê be.⁶²

10.6. Cînavê "çend"

Bi cînavê "çend" di kurdî de bi armanca pirsîna hejmara tiştêkî tê bikaranîn:

- Hûn çend kes in?
- Tu çend salî yî?
- Ew çend bûn?

Wek cînav, di kurmanciya navendî de ew tenê bi vê meremê li kar e, li cihê "how many" ya inglîzî. Lê di kurmanciya rojhilatî û herwiha di soranî de jî ew herwiha li cihê "çiqas" (çiqas) ya kurmanciya navendî jî li kar e (bi inglîzî "how much"):

- Ew bi çendê ye? (Ew bi çi qasî ye?)
- Te heta çendê hejmart? – Heta sedê.

"Çend" herwiha wek hoker jî bi maneya "hinek, hindek, hin" tê bikaranîn:

- Çend kes li wê derê bûn. (Hin kes li wê derê bûn.)

"Çend" di kurmancî, soranî, zazakî û farisî de bi heman şiklê "çend" li kar e. Ew di van hemû zar û zimanan bi forma xwe ya kurtkirî "çen" jî peyda dibe. Di kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) de forma serdest "çen" yan "çenn" e, di hewramî "çinne". Rehên peyva "çend" digihin makezimanê proto-hindûewropî jî:

- pehlewî "çend"
- hexamenişi "çiyent-"
- avestayî "çvent-"
- sanskrîtî "kivent-"

⁶¹ <http://www.pen-kurd.org/kurdi/sedat-yurtdas/malava.html>

⁶² Bo hîperkorektiyê binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/hiperkorekti-anku-zede-rasti/>

- latînî “quantus”
- îtalî û portugalî “quanto”
- spanî “cuando”
- fransî “quant”

Hemû ji proto-hindûewropî **kuih^hent-*“ (çend) ji **k^wis* (çi, kî). K-ya proto-hindûewropî bi piranî di zimanên îranî de dibe Ç yan S.

Wek pêşdiyarker (berî navdêran), peyva “çend” bêhejmar, bêcins û neçembar e:

- çend jin?
- çend mêr?
- çend kesan?

Wek cînavekî serbixwe, “çend” li gor hejmarê diçeme:

- Tu ê çendan bixwî? (bo nimûne “çend sêvan?”)

Di kurmanciya rojhilatî de “çend” dikare bi yekhejmarî jî wek mê biçeme:

- kurmanciya rojhilatî: Te ew bi çendê kirrî?
- kurmanciya navendî: Te ew bi çi qasî kirrî?

10.7. Hokerên pirsyarkî: kû, ka, kengî, çiqas...

Gelek caran peyvên “kû” (li çi derê), “ka” (li kû ye), “kengî” (çi demê), “çiqas” (çi miqdar) û hin peyvên din jî li gel cînavên pirsyarkî tên rêzkin û behskirin.

Lê ev peyv ne cînavên pirsyarkî lê hokerên pirsyarkî ne. Loma em ê wan li gel hokerên din di vekolîneke xwe ya din de behskirin.

11. Cînavên raveker

11.1. Cînavên raveker û tevokên raveker

Cînavên raveker yan *cînavên têkiliyê* (bi inglîzî *relative pronoun*) tevoka serekî û hevoka ravekî bi hev ve girê didin. Mebest ji **tevoka serekî** (bi inglîzî *main clause*) ew beşa hevokê ye ku dikare serbixwe wek hevokeke temam were bikaranîn. Mebest ji **tevoka raveker** (*relative clause*) ew **tevokên binekî** (*subordinate clause*) ne ku tevoka serekî rave dikin. Kerem bikin em li vê van nimûneyan binêrin:

- Yê ku hat, birayê min bû.
- Ev Hesên e ku mamoste ye.
- Mala ku ew lê dijîn biçûk e.

Di her yekê ji van hevokan de tevokeke serekî û tevokeke raveker heye. Eger em tevokên raveker biavêjin, tevokên serekî dê wiha bimînin:

- Birayê min bû.
- Ev Hesên e.
- Mal biçûk e.

Wek ku tê dîtin, tevokên serekî dikarin bêyî tevokên raveker jî bên bikaranîn lê tevokên raveker - wek navê xwe – tevokên serekî rave dikin û zêdetir agahiyên li ser wan didin me. Lê tevokên raveker bi xwe nikarin bi tenê wek hevokên temam bên bikaranîn:

- *Yê ku hat.
- *Ku mamoste ye.
- *A ku ew lê dijîn.

11.2. Rêzbendîya tevokan

Di kurdî de tevoka raveker dikare (tevoka raveker di nimûneyan de hatiye *xwehkirin*):

- **berî tevoka serekî be.** Bo nimûne: *Yê ku hat, birayê min e.*

- **piştî tevoka serekî be.** Bo nimûne: Ev Hesên e *ku mamoste ye.*
- **di nav tevoka serekî re be.** Bo nimûne: Mala *ku ew lê dijîn* biçûk e.

Di hin zimanan de tevokên serekî û tevokên raveker herdem bi bêhnokekê (vîrgulekê) ji hev tîn veqetandin. Lê di kurdî û piraniya zimanan de adeten bêhnok tenê hingê tê bikaranîn, eger tevoka raveker berî tevoka serekî were bikaranîn:

- Yê ku hat, birayê min bû.

Bikaranîna bêhnokê herwiha hingê jî mimkin e gava ku tevoka raveker piştî tevoka serekî be:

- Ev Hesên e[,] ku mamoste ye.

Lê gava ku tevoka raveker di nav tevoka serekî re be, bikaranîna tevokê di kurdî de dijwar e. Hingê ne bêhnokek lê du bêhnok divê bên bikaranîn daku tevoka raveker li destpêk û dawiya wê, wê ji tevoka serekî veqetînin:

- Mal[,]a ku ew lê dijîn[,] biçûk e.

Hin caran tê dîtin ku tenê bêhnokek tê bikaranîn, adeten li dawiya tevoka raveker lê ne li destpêka wê:

- Mala ku ew lê dijîn[,] biçûk e.

Lê ev awayê ne tevlihevker e ji ber ku ew peyva “mal” ya endama tevoka serekî jî bi tevoka raveker ve dihêle û hem tevoka serekî û hem jî tevoka raveker şêlû dike.

11.3. Cînavên raveker di kurmancî de

Cînavên ravekî di kurmancîya giştî de ev in:

- **(y)a** (yekhejmar mê)
- **(y)ê** (yekhejmar nêr)
- **(y)ên** (pirhejmar)

Ew di kurmancî de bi piranî li gel peyva **ku**⁶³ tên bikaranîn. Wek cînavên serbixwe, di kurmanciya rojhilatî de ew bi formên xwe yên bi Y (ya, yê, yêt/yêd) tên bikaranîn, di kurmanciya navendî de bi formên bêyî Y (a, ê, ên) tên bikaranîn. Di zimanê nivîskî de herdu form jî tên dîtîn:

kurmanciya rojhilatî:

- Yê ku hat, birayê min e.
- Ya ku hat, xwişka min e.
- Yêt/yêd ku hatin, hevalêt/hevalêd min in.

kurmanciya navendî û rojavayî:

- Ê ku hat, birayê min e.
- A ku hat, xwişka min e.
- Ên ku hatin, hevalên min in.

Di kurmanciya rojavayî de gelek caran forma pirhejmar jî “ê” ye:

- Ê ku hatin, hevalên min in.

Gava ku cînavên raveker li pey navdêrekê bin, ew li gor cins û hejmara wî navdêrî diguherin:

- Mala ku ew lê dijîn biçûk e.
- Bajarê ku ew lê dijîn biçûk e.
- Sêvên ku me xwarin xweş bûn.

Eger peyva pêştir bi konsonantekê bi dawî were, hingê formên bêyî Y (-a, -ê, -ên) tên bikaranîn. Lê eger peyva pêştir bi vokalekê bi dawî were, hingê formên bi Y (-ya, -yê, -yên) tên xebitandin:

- Kitêba / rojnameya ku dixwînim kevn e.
- Bajarê / xaniyê ku lê dijîm mezin e.
- Kolanên / rêyên ku pê ve dimeşim ne teng in.

Ji bilî, navdêran, ravek dikarin herwiha bikevin pey cînavan jî:

- Ewê ku hat birayê min e.
- Ewa ku hat xwişka min e.

⁶³ Di kurmancî de carinan wek “go, ke, kî, ko, kû” jî tê nivîsîn lê forma serdest “ku” ye. Di soranî û zazakî de forma serdest “ke” ye.

- Ewên ku hatin hevalên min in.

Di rastiye de formên wek “yê ku hat, birayê min e” jî formên kurtkirî yên “ewê ku hat, birayê min e” ne.

11.4. Cînavên raveker di zar û zimanên lêzim de

Di soranî de cînavên raveker yê serbixwe (ne li pey navdêran girêdayî) “hî” ye ku bêcins û bêhejmar e:

- hî ke hat, biray min e (yê ku hat, birayê min e)
- hî ke hat, xwêşkî min e (yak u hat, xwişka min e)
- hî ke hatin, hawrêyekanî min in (yên ku hatin, hevalên min in)

Cînavên raveker yên girêdayî di soranî de jî wek di kurmancî de bi alîkariya ravekan û girêdeka “ke” (ku) tên avakirin. Ew li gor hejmarê (lê le li gor cinsî) tên cudakirin:

- malî **ke** lê dejîm biçûk e (mala *ku* lê dijîm biçûk e)
- şarî **ke** lê dejîm biçûk e (bajarê *ku* lê dijîm biçûk e)
- sêwekanî **ke** xwardim xoş bûn (sêvên *ku* min xwarin xweş bûn)

Di zazakî de cînavê raveker yê serbixwe bo her cins û hejmara rêzimanî cuda ye:

- o ke ame, birayê min o. (yê ku hat, birayê min e.)
- a ke ame, waya min a. (ya ku hat, xwişka min e.)
- ê ke ameyî, ambazê min ê. (yên ku hatin, hevalên min in.)

Cînavên raveker yên girêdayî jî di zazakî ji ravekên navdêran û girêdera “ke” (ku) pêk tên.

Di farisî de jî cînavên raveker yên girêdayî ji ravekên (izafe) navdêran û girêdera “kê” (herwiha “kî”) pêk tê.

12. Cînavên nediyar

12.1. Cînavên nediyar çi ne?

Mebest ji cînavên nediyar⁶⁴ ew cînav in ku amaje bi ti tiştêkî bernas yan diyar nakin lê bi awayekî giştîtir in. Hin ji wan cînavên nediyar yên giştî, hin yên neyînî û hin jî yên bijarî ne. Ew dikarin amaje bi mirovan an jî tiştan an jî herduyan bikin. Hin ji wan amaje bi tiştên hejmêrbar bikin, hin bi yên nehejmêrbar û hin jî bi herduyan.

Hêjayî gotinê ye ku gelek ji cînavên nediyar tenê di hin haletên bikaranînê de cînav in. Ew di hin haletên din de endamên yek yan çend birrên din yên peyvan in. Bo nimûne, peyvên “gelek” û “kes”:

- “Gelek hatin.” (gelek = cînav) Lê “Ew gelek baş bûn.” (gelek = hoker.) û “Ev gelek e.” (gelek = rengdêr).
- “Kes nehat.” (kes = cînav) Lê “Em du kes in.” (kes = navdêr.)

12.2. Rêzkirina cînavên nediyar

Di tabloya li jêr de em ê van cînavan li gel varyant û bikaranîna wan rêz bikin. Em ê herwiha diyar bikin ka ew bo amajekirina bi mirovan yan tiştan/heywanan an jî herduyan tîn bikaranîn. Em ê wê jî diyar bikin ka ev cînav tê çemandin (tewandin) yan na di bin sernavê “çembar” de. Di tabloyê de mebest ji + “erê” û ji – jî “na” ye. Li jêrtir em ê yek bi yek li ser van cînavan hûrtir rawestin.

cînav	varyant	mirov	tişt/heywan	çembar	wate bi inglîzî
çend ⁶⁵	çen	+	+	+	some, a few
çendîn	çendan	+	+	-	several
(ya/yê/yên) din	dî, dîtir, di, dinê, dîtirê	+	+	+	other
eynî		+	+	+	same

⁶⁴ Di hin rêzimanan de “cînavên nebinavkirî”.

⁶⁵ Bi maneya “hin, hinek, hindek”, wek “çend kes hatin” (hin kes hatin).

filan (kes / tişt)	fulan	+	+	+	so-and-so, such-and-such
gelek	gele	+	+	+	many, a lot, lots of
gişt	giş, gişk, gî ⁶⁶	+	+	+	all
heman		+	+	?	same
hemû⁶⁷	hemî, hemîçk, hemûşk	+	+	+	all
her		+	+	-	every
her kes	herkes	+	-	+	everyone
her tişt	hertişt	-	+	+	everything
her der	herder, her cî, her cih	-	+	+	everywhere
heçî	her çi, her kî	+	+	+	whoever, whatever
herdu	her du	+	+	+	both
hin	hinek, hindek, hindik	+	+	+	somebody, something
hiç	hêç	+	+	+	none, not any
kes	kesek	+	-	+	anyone, no one
kêm		+	+	+	few
piçek		+	+	+	a little, some
pir	pirr	+	+	-	many, lots of, a lot

⁶⁶ Di kurmanciya rojhilatî de nayê bikaranîn.

⁶⁷ Di kurmanciya rojavayî û piraniya kurmanciya navendî de nayê bikaranîn, li cihê wê "gişt" yan varyanteke wê li kar in.

tev ⁶⁸	-	+	+	+	all, altogether
ti	çu, tu, çi	-	+	-	nothing
ti kes	çu kes, tu kes, çi kes	+	-	+	on one, nobody
ti tişt	çu tişt, tu tişt, çi tişt	-	+	+	on one, nobody
tişt	tişte	-	+	+	anything, nothing
xirr ⁶⁹	xirrek, xir, xirek	+	+	+	all
yek	êk, yêk	+	+	+	one, someone
zehf	zaf, zahf	+	+	-	many, plenty, lots of
zêde		+	+	-	too many

Li jêr jî em ê yek bi yek li ser taybetmendiyan van cînavan rawestin û li gor pêwîstiya nimûne ji wan bidin.

Çend

Bi eslê xwe “çend” cînavêkî pirsyarkî ye û me li jor, di nav cînavên pirsyarkî de etîmolojiya wê diyar kiriye. Lê di zar û zimanên îranî de ew herwiha wek cînavêkî nediyar yê bi wateya “hin, hinek, hindêk” jî tê bikaranîn.

⁶⁸ Bi pîranî di kurmançiya rojavayî de, carinan di kurmançiya navendî de jî lê ne di kurmançiya rojhilatî de.

⁶⁹ Tenê li hin deverên kurmançiya rojhilatî (bi taybetî li Dihokê) tê bikaranîn.

Çendîn, çendî, çend, çendan

Cînavê “çendîn” û varyantên wî “çendan” û “çendî çend” bi maneya “gelek, pir” jî tê bikaranîn:

- çendîn caran (gelek caran, pir caran)
- çendî çend salan (gelek salan)

Ji bilî kurmancî, ew herwiha di soranî û farisî de jî li kar in.

Çu, çi

Binêrin: Ti, tu

(ya/yê(yên) din

Cînavê nediyar “din” di forma serdest ya kurmanciya nivîskî ye lê li gor devokan ew dikare bi çendîn awayên ji hev cuda be:

- kurmanciya rojhilatî: dî, dîtir, dîtirê
- kurmanciya navendî: din, dinê
- kurmanciya bakur-rojhilatî (serhedî): di, din

Hevrehên wê jî di zar û zimanên lêzim de wiha ne:

- soranî: dî, dîke, tir
- bîn
- farisî: dîger, dîgê (→ tirkî “diğer”)
- pazendî: dedîger
- pehlewî: dîtîker
- avestayî: dvitiye kere

Cudahiya cînavê “din” û varyantên wî li gel cînavên din yê nediyar ew e ku ew ne pêşdiyarker e lê paşdiyarker e anku ew dikeve dûv tiştê ku rave dike, ne berî wî. Bo nimûne:

- hevalên din (bidin ber “çend heval, gelek heval, hemû heval, her heval” û hwd.)

Li cihê cînavê “din”, bi taybetî di kurmanciya rojavayî de hevwatera wî ya tirkî **başqe** (ji tirkî “başka”) ji mêj ve cihê xwe girtiye. Ew ne tenê li nav sinorên Tirkiyê di kurdî de li kar e lê heta derbazî Rojavayê Kurdistanê de vera Efrînê û herwiha li Serhedê derbazî kurdiya Ermenistanê jî bûye.

Cînavê “din” û varyantên wî ne li gor cinsî û ne jî li gor hejmarê naçemin lê navdêran berî wî li gor cins û hejmarê xwe ya rêzimanî raveka mê, nêr yan pirhejmar werdigire:

- hevala din
- hevalê din
- hevalên din

Berevajî “din” û varyantên wê yên din yên kurdî-îranî, hevwatera wê ya ji tirkî wergirtî “başqe” ne paşdiyarker lê pêşdiyarker e anku ew dikeve berî peyva raveber:

- başqe tişt (“tiştên din” yan “tiştên din”)
- başqe kesek (kesekî/keseke din)

Eynî

Peyva “eynî” (‘eynî, aynî, ‘aynî) maneya “heman, wek tiştêkî, ne ji tiştêkî cuda” dide. Ew dikare wek rengdêr, hoker û wek cînav were xebitandin.

“Eynî” bi eslê xwe ji erebî ye lê ketiye zimanên din jî (bo nimûne kurdî, farisî, tirkî). Eslê wê peyva erebî ‘eyn anku “çav” e: mebest ji “eynî” bi eslê xwe ew tişt in ku li gor dîtina bi çavan dişibin hev. Ji ber ku “eynî” bi eslê xwe ji erebî ye, di zimanê nivîskî de hin kes gelek caran peyva “heman” tercîh dikin ku vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî (li jêrtir binêrin).

“Eynî” di kurdî de wek pêşdiyarker û hem jî mîna cînavêkî serbixwe tê xebitandin. Bo nimûne:

- Eynî kes hatin. (pêşdiyarker)
- Eynî hatin. (cînavê serbixwe)

Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê bikaranîn:

- eynî kes → eynî kesî, eynî kesê, eynî kesan

Wek cînav ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were:

- ez eyniyê dibînim. (ez eynî kesê dibînim)

- ez eynî/eyniyî dibînim. (ez eynî kesî dibînim)
- ez eyniyan dibînim. (ez eynî kesan dibînim)

Lê carinan ew dikare bi forma xwe ya “eynî” li cihê van her sê formên “eniyê, eynî/eyniyî, eyniyan” jî were xebitandin:

- ez eynî dibînim (eynî kesê, eynî kesî, eynî kesan)

Filan

Cînavê “filan” (carinan “fulan”) ne tenê di lehceyên kurdî de lê di piraniya zimanên Rojhilata Navîn de (di kurdî, erebî, farisî, tirkî û çendîn zimanên din de) li kar e. Ihtimalen eslê wê erebî ye lê belav bûye nav zimanên din jî. Ew hem serbixwe û hem jî wek “filan kes” yan “filan tişt” tê xebitandin. Herwiha ew bi awayê “filan û bêvan”⁷⁰ û “filan û fîstan” jî tê gotin û nivîsîn.

“Filan” cînavêkî wek pêşdiyarker neçembar e:

- filan kes
- filan kesî
- filan kesê
- filan kesan

Lê wek cînavêkî serbixwe ew bi temamî çembar e:

- filanî got (wî got)
- filanê got (wê got)
- filanan got (wan got)

Gelek

Peyva “gelek” li gor haletê bikaranîna xwe dikare hoker, rengdêr an jî cînav be. Li vê derê em ê bikaranîna wê ya cînavî diyar bikin.

⁷⁰ Li gor hin devokan “filan û bêhvan” yan “filan û bihvan”.

Gelek bi eslê xwe ji peyvên “gel” (kom) û “-ek” (yek) pêk hatiye, wek “hin-ek, piç-ek” e. Ev paşgira “-ek” ya çemandinê hê jî di dengnasiya peyva “gelek” de diyar e ji ber ku giraniya anku kirpa peyvê li ser “gel-“ e, ne li ser “-ek” ji ber ku paşgirên çemandinê adeten di kurdî de bê giranî ne. Bi heman awayî ew di peyvên “hin(d)ek” û “piçek” de jî li ser kîteya yekem e, ne li ser paşgira “-ek” e.

Gelek berê tenê di kurmanciya rojhilatî de û di devokên soranî yê nêzîkî kurmancî de de li kar bû lê bi rêya zimanê nivîskî û medyayê êdî li deverên din jî yê kurmancî û soranî tê bihîstin. Wek din li cihê wê di kurmancî de peyva “pir”, di soranî de “zor” û di zazakî de “zaf” li kar e. Li derveyî kurmancî û soranî, di zar û zimanên din yê îranî de peyva “gelek” û hevrehên wê peyda nabin.

Peyva bi “gelek” bi eslê xwe ji peyva “gel” (kom) û paşgira “-ek” (yek) pêk hatiye, anku “ gelek = komek, ne tenê kesek yan tiştek”. Bi heman awayî peyvên “piçek, hin(d)ek” ji peyveke serbixwe û paşgira “-ek” pêk hatine.

Di kurmancî de di axiftinê de gelek caran wek “gele” anku bêyî K-ya dawiyê tê gotin, xaseten gava ku wek pêşdiyarker berî navdêrekî tê xebitandin:

- gele(k) kes, gele(k) mirov, gele(k) êş

Herwiha gava ku ew wek hoker li berî rengdêran jî tê emilandin, xaseten di kurmanciya rojhilatî de ew bi awayê “gele” tê bihîstin:

- gele xweş

Alternatîva wê ya hokerî di kurmanciya navendî de adeten “gelekî” ye:

- gelekî xweş

Di soranî de li gel forma “gelek”, herwiha awayên “gelêk, gelê” jî li kar in. Di soraniya nivîskî de lihevkirineke sertaserî nîne ka paşgira bi maneya “yek” wek “-ek”, “-êk” yan “-ê” were nivîsîn.

Peyva gelek wek pêşdiyarker li berî navdêran naçeme û ravekê jî nagire:

- gelek kesan (ne “*gelekan kesan”)

Peyva “gelek” bi serbixweyî çembar e:

- gelekê venexwin (gelek avê/şerabê venexwin)

Ji aliyê hejmara rêzimanî ve peyva “gelek” dikare hem wek yekhejmar û hem jî pirhejmar be:

- gelekê nexwin (gelek birincê/savarê nexwin)
- gelekên nexwin (gelek sêvan/soxan nexwin)

Ji aliyê cinsî ve bi temamî ne diyar e ka herdu cins hene yan jî na ji ber ku di kurmanciya rojhilatî de (ku peyva “gelek” tê de bi berfirehî tê bikaranîn) forma çemandî ya paşgira nediyariyê “-ek” ji herdu cinsan re wek hev “-ekê” ye. Di kurmanciya navendî de (ku bikaranîna peyva “gelek” tê de bisinor e) û di kurmanciya nivîskî de vê paşgirê du formên çemandî yên mê (“-ekê”) û nêr (“-ek”) hene. Forma “gelekî” di kurmanciya navendî de zêdetir wek forma hokerî, ne ya cînavî ya nêr, li kar e. Lê beraqil e ku mirov li gor qeydên giştî yên zimanê nivîskî herdu formên nêr (gelekî) û mê (gelekê) binivîse:

- gelekê venexwe (= gelek avê venexwe” ji ber ku “av” mê ye)
- gelekî nexwe (= “gelek nanî nexwe” ji ber ku “nan” nêr e)

Gişt

Peyva “gişt” maneya “hemû, hemî, tev, kull, bitûn” dide. Ew hem di kurmancî û hem jî di soranî de peyda dibe lê ne li her deverê. Di herdu zaran de ew bi awayê “giş” anku bêyî T li dawiyê jî li kar e. Di kurmancî de li hin deran herwiha li cihê “gişt” forma “gişk” jî heye. Di kurmanciya rojavayî de ew herwiha bi forma “gi, gih, gî” tê bikaranîn.

Peyva “gişt” ji aliyê rehnaşî ve ji proto-hindûewropî ye û hevrehên wê hem di şaxên hindûîranî û hem jî di zimanên slavî de peyda dibe: sanskrîtî û hindî विष् (vísva), çekî vše, весь (ves’), slovakî všetok û hwd. Bo guherîna V bi G, bidin ber kurmancî “gul, gur(g), giya” û zazakî “vil, verg, vaş/vas” û hwd.

Tiştê ecêb ew e ku ew di kurmanciya navendî û kurmanciya rojavayî de û herwiha di soranî de jî heye lê di kurmanciya rojhilatî de – ku dikeve navbera kurmanciya navendî û soranî – peyda nabe.

Peyva “gişt” û varyantên wê dikarin hem wek pêşdiyarker û hem jî paşdiyarker werin bikaranîn. Li vê derê mebesta me ji “pêşdiyarker” ew e ku cihê wê berî peyva serekî yan û mexsed ji “paşdiyarker” ew e ku ew li pey peyva serekî tê bikaranîn:

- wek pêşdiyarker: gişt heval
- wek paşdiyarker: heval gişt

Wek paşdiyarker ew herdem neçemandî û bêyî ravek e:

- heval gişt hatin

Husein Muhammed: *Cînavên kurdî*

- hevalan gişt hatin (ne “*hevalan giştan hatin”)

Wek pêşdiyarker “gişt” dikare li gel ravekê jî were bikaranîn:

- bêravek: gişt heval hatin, gişt hevalan got
- biravek: giştê hevalan hatin, giştê hevalan got

Lê wek pêşdiyarker jî peyva “gişt” nayê çemandin:

- gişt / giştê hevalan got (lê ne “*giştan hevalan got”)

Wek cînavêkî serbixwe (ne wek pêşdiyarker yan paşdiyarker), peyva “gişt” dikare wek nêr, mê û pirhejmar biçeme:

- mê: giştê dibînim (wek “wê dibînim”)
- nêr: giştî dibînim (wek “wî dibînim”)
- pirhejmar: giştan dibînim (wek “wan dibînim”)

Heçî

Peyva “heçî” maneya “her kî jî be” yan jî “her çi jî be” tê bikaranîn. Ew kurtkriina “her çi jî” ye. Bi wateya “her kî jî be” ew herwiha bi şiklê “herkî, hekî” jî tê bihîstin.

Ew hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînavêkî serbixwe tê xebitandin. Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê emilandin:

- heçî kesê (ku) bike
- heçî kesa (ku) bike
- heçî kesên (ku) bikin

Wek cînavêkî serbixwe ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were çemandin:

- heçiya ku bike
- heçiyê ku bike
- heçiyên ku bikin

Heman

Peyva “heman” maneya “eynî, wek tişteki, ne ji tişteki cuda” dide. Ew dikare wek rengdêr û wek cînav were xebitandin.

Tarîxiyên “heman” di kurdî, xaseten di kurmançî, de nû ye. Ew vê dawiyê bi rêya zimanê nivîskî û medyayê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurdî. Ji aliyê rehnasî ve ew ji farisî “hem-an” e û “hem”a wê jî hevreh “hev” ya kurmançî û “haw-“ ya soranî ye.

“Heman” di kurdî de wek pêşdiyarker û hem jî mîna cînavêki serbixwe tê xebitandin. Bo nimûne:

- Heman kes hatin. (pêşdiyarker)
- Heman hatin. (cînavê serbixwe)

Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê bikaranîn:

- heman kes → heman kesî, heman kesê, heman kesan

Wek cînav ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were:

- ez hemanê dibînim. (ez heman kesê dibînim)
- ez hemanî dibînim. (ez heman kesî dibînim)
- ez hemanan dibînim. (ez heman kesan dibînim)

Lê carinan ew dikare bi forma xwe ya “heman” li cihê van her sê formên “hemanê, hemanî, hemanan” jî were xebitandin:

- ez heman dibînim (heman kesê, heman kesî, heman kesan)

Hemû / hemî

Peyva wateya “gîşt, tev, xirr(ek), kul, cemî’, bitûn” dide. Ew di kurmançiya navendî û di soranî de bi şiklê “hemû” ye. Di kurmançiya rojhilatî de forma serdest “hemî” ye lê herwiha formên biçûkkirî “hemîçk, hemûçk, hemîşk, hemûşk” di kurmançiya rojhilatî de li hin deveran (bi taybetî li Dihokê û Hekariyan) tên bihîstin. Di kurmançiya rojavayî de tarîxiyên ti ji van forman peyda nedibûn yan jî nemabûn lê vê dawiyê bi rêya zimanê nivîskî û medyayê “hemû” ketiye ser zimanê hin qisekerên kurmançiya rojavayî jî.

Di zazakî de hem peyv bi awayê “heme” peyda dibe. Di farisiya klasîk de jî ew “heme” bû lê niha li ser devê xelkê bûye “hemê”. Di pehlewî de ew bi şiklê “hemeg” bû. Hemû hevrehên peyvên “heman,

hev” e û eslê wan heta makezimanê proto-hindûewropî jî diçe: yûnaniya kevn “homos” (giştî, tevahî, hev-, heman), sanskrîtî “sema-“, inglîzî “same” (heman, eynî). Bo guherîna S bi H, bidin ber kurdî “heft” û yûnanî “hêpta” lê sanskrîtî “septan”, latînî “septem” û inglîzî “seven”.

Di kurmanciya rojhilatî û di soranî de H-ya peyvê wek ya di peyvên “heval, her” de ye lê di kurmanciya navendî de ew bi H-ya wek di peyvên “heft, Hesên” de ye ku bi alfabeya erebî bi tê nivîsîn.

Peyva “hemû, hemî” bi piranî wek pêşdiyarker tê bikaranîn. Wek pêşdiyarker ew nediçeme û ne jî ravekê digire:

- hemû دنیا → hemû dinyayê (ne “hemûyê dinyayê” yan “*hemûya dinyayê”)

Carinan ew wek paşdiyarker (bêyî ravekê û çemandinê) jî tê xebitandin:

- دنیا hemû dizane → dinyayê hemû zaniye

Wek cînavê serbixwe, ew dikare wek mê, nêr û pirhejmar were emilandin:

- hemûyê bixwin (wek “şîvê bixwin”)
- hemûyî bixwin (wek “nanî bixwin”)
- hemûyan bixwin (wek “sêvan bixwin”)

Her

Peyva “her” wateya “yek bi yek, hemû, her yek ji endamên komekê” dide. “Her” di hemû zar û devokên kurdî de û di piraniya zimanên din jî yêr îranî de bi heman maneyê li kar e. Ew herwiha wek “her” bi heman maneyê derbazî zimanên tirkî, urdûyî û hindî jî bûye û di wan de jî bi berfirehî tê bikaranîn.

Rehên peyva “her” digihin makezimanê proto-hindûewropî. Ew bi pehlewî “herw”, bi avestayî û hexamenişî “heurve-“, bi sanskrîtî “serve-“, bi latînî “salvus” û bi yûnaniya kevn jî jî “holos” bû ku serekaniya peyvên wek “hologram, holîstîk, holokost” û gelek peyvên me yêr din jî yêr ji yûnanî ye.

Peyva “her” wek cînavê pêşdiyarker yê bêravekê û neçembar tê bikaranîn:

- her roj → her rojê (ne “*herê rojê” yan “*hera rojê”)
- her kes → her kesî (ne “*herî kesî” yan “*here kesî”)

Bi pêkanîne çendîn cînavên din jî kurdî, farisî û tirkî de tên çêkirin. Beşa duyem adeten navdêr e lê dikare hejmar be (bo nimûne “**herdu**, her sê...”) yan jî cînavêkî pirsiyarkî be (**herçi, herçend**):

- **her kes**
- **her der**
- **her tişt**
- **her roj**
- **her car**

Carinan ev peyv bi hev ve jî tên nivîsîn: herkes, herder, hertişt, herroj (carinan “heroj” yan “hero”), hercar. Lê bo zelaliyê çêtir e ku ew ji hev cuda bînin nivîsîn. Wek din, sinorê navbera yên bi hev ve bînin nivîsîn û yên ji hev bînin cudakirin, ne diyar e. Bo nimûne, eger em binivîsin “herroj”, çima em nenivîsin “herşev”. Yan eger em binivîsin “hertişt”, çima em nenivîsin “hersêv”, “herkitêb” û hwd.

Hin, hinek, hindek

Peyvên “hin, hinek, hindek” maneya “çend kes yan çend tişt” yan jî “ne kêr û ne jî zêde” dide. Di kurmanciya navendî û kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya latînî de formên serdest “hin, hinek” in. Di kurmanciya rojhilatî de forma serdest “hindek” e lê carinan jî forma kurtkirî “hin” tê bihîstin.

Eslê peyvê têkilî peyva “hind” anku “ew qas” e ku heta niha jî di kurmanciya rojhilatî de û bi paşgira “-ek” hatiye saz kirin, wek peyvên “gelek, piçek” jî. Di soranî de ew wek “hendêk” heye û di farisî de jî bi forma “endek” hebû lê di farisî de ji bikaranîne ketiye.

Peyvên “hin, hinek, hindek” hem wek cînavên serbixwe û hem jî wek pêşdiyarker tên xebitandin. Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û çemandinê li kar e:

- hin kes, hinek kes, hindek kes → hin kesan, hinek kesan, hindek kesan

Wek cînavêkî serbixwe jî ew wek pirhejmar tê çemandin û ravekirin:

- hinan, hinekan, hindekan (hin kesan, hin tiştan)
- hinên din, hinên baş, hinên xweş (hin tiştên din, hin kesên baş, hin xwarinên xweş)...

Hindik

Peyva “hindik” bi maneya “kêm, piçek” li kar e. Ew di kurmanciya navendî û rojavayî de heye lê di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe. Berevajî vê, di kurmanciya rojavayî û navendî de hevwateryên wê “piçek, kêm” nayên bikaranîn an jî kêm tên xebitandin.

Peyva “hindik” bi rastî wek rengdêr û hoker tê emilandin lê carinan wek cînav jî li kar e. Wek cînav ew dikare hem cînavê serbixwe be û hem jî wek pêşdiyarker tê şuxilandin:

- Hindik hatin. (kêm kes hatin)
- Hindik kes hatin.

Wek pêşdiyarker ew naçeme û ravekê jî nagire:

- hindik kes dizanin → hindik kesan dizanî

Wek cînavê serbixwe ew bi pirhejmarî diçeme û ravekê jî digire:

- hindikan dizanî
- hindikên ku dizanin

Hîç

Peyva “hîç” maneya “ti, qet” dide. Ew dikare wek rengdêr, hoker û cînav were bikaranîn.

“Hîç” bi eslê xwe peyveke îranî ye ku di soranî û farisî de jî heye û di pehlewî de jî bi şiklê “êç” li kar bû. Ew ji zimanên îranî wek “hiç” ketiye tirkî jî. Lê bikaranîna peyva “hîç” di kurmancî de tarîxiyên kêm bû yan jî kêm bûbû lê vê dawiyê li ber tesîra tirkî yan soranî yan farisî yan jî wan hemûyan dîsa ber bi zêdebûnê ve ye. Lê heta niha jî di kurmancî de li cihê wê zêdetir peyva “ti” yan yek ji varyantên wê “tu, çu, çî” tê emilandin.

Wek pêşdiyarker ew bê ravek û bê çemandin tê xebitandin:

- hîç kes → hîç kesî/kesê/kesan

Lê wek cînavê serbixwe ew carinan diçeme û dikare ravekê jî digire:

- hîçan nabînim (hîç kesan/tiştan nabînim)
- hîçên baş tine bûn (ti kesên/tiştên baş tine bûn)

Kes, kesek

Peyva “kes” bi eslê xwe navdêr e lê ew herwiha wek cînav jî tê bikaranîn. Peyva “kes” ji bilî kurmancî, herwiha di zarên din yên kurdî û zimanên din yên îranî de jî bi heman şiklê “kes” li kar e û li gel peyva “her” wek “herkes” ketiye zimanê tirkî jî.

“Kes” wek cînav adeten di hevokên neyînî de li cihê “ti kes” tê xebitandin:

- Kes nehat (ti kes nehat)

Lê carinan di hevokên erênî, bi taybetî yên pirsyarkî de jî peyda dibe:

- Kes dizane? (Ma kesek heye ku bizane?)

Wek cînavê serbixwe, peyva “kes” çembar e:

- Kesî negot (ti kesî negot)

Li cihê forma “kes”, bikaranîna forma nediyar ya yekhejmar “kesek” û formên wê yên çemandî jî mimkin in:

- Kesek nehat. (Ti kes nehat)
- Kesekî negot. (Ti kesî negot.)

Kêm

Peyva “kêm” maneya “hindik, piçek, ne gelek, ne zehf, ne zêde” dide. Di kurdî de ew bi piranî wek hoker û rengdêr tê xebitandin lê bikaranîna wê wek cînav jî mimkin e:

- Kêm hatin. (Kêm kes hatin.)
- Kêman ew dîtiye. (Kêm kesan ew dîtiye.)

“Kêm” peyveke kurdî-îranî ye, di soranî de jî hem wek “kêm” û hem jî wek “kem” tê bikaranîn, di farisî de “kem” e û di pehlewî de jî “kem” bû. Di kurmancî de “kêm” bi taybetî di kurmanciya rojhilatî de û hinekî jî di kurmanciya navendî de tê bikaranîn lê di kurmanciya rojavayî de yan peyda nabe yan jî pir kêm tê xebitandin. Di zazakî de wek “kemî” li hin deveran heye lê peyva serdest ya bi vê

maneyê di wî zarî de “tay, tayn” e. Di kurmancî de li cihê “kêm” carinan forma “kêmek” jî tê emilandin, li ber modela “gel-ek, piç-ek, hin-ek” û hwd.

“Kêm” hem dikare wek cînavê serbixwe û hem jî wek pêşdiyarker were bikaranîn. Gava ku ew wek pêşdiyarker tê şuxilandin, ew bêyî ravek û çemandinê dikeve berî peyva raveber:

- kêm tişt → kêm tiştan (ne “*kêman tiştan”)
- kêm mirov → kêm mirovan (ne “*kêman mirovan”)

Wek cînavê serbixwe ew dikare bibe pirhejmar û wisa biçeme jî:

- Kêm dibêjin (kêm kes dibêjin) → kêman got (kêm kesan got)

Piçek

Peyva “piçek” maneya “kêm hindik, ne gelek/zêde” dide. Ew hem wek rengdêr, hoker û cînav jî tê xebitandin.

Bi vê erkê xwe “piçek” wek “hinek” û “gelek” ji paşgira “-ek” pêk hatiye. Destpêka wê “piç” jî maneya “biçûk, pirt, pirtik, çip, tişteki pir hûrik” e.

Bergeha cografî ya peyva “piçek” tarîxiyên teng e: ew bi berfirehî tenê di kurmanciya rojhilatî de li kar bûye. Niha bi nivîsînê li deverên din jî yê kurmancîaxiv berbelav bûye.

Peyva “piçek” hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînavê serbixwe tê xebitandin. Wek pêşdiyarker ew bêyî ravek û bêyî çemandinê tê emilandin:

- piçek nan → piçek nanî (ne “*piçekî nanî”)
- piçek sêvê → piçek sêvê (ne “*piçekê sêvê”)
- piçek kes → piçker kesan (ne “*piçekan kesan”)

Wek cînavê serbixwe ew wek pirhejmar tê xebitandin û çembar e:

- piçek çûn (piçek kes çûn)
- piçekan dît (piçek kesan dît)

Pir, pîrr

Peyva "pir" yan "pîrr" di kurmancî de maneya "gelek, zehf, zor, mişe" dide. Ji aliyê rêzimanî ve hem wek rengdêr, hem wek hoker û hem jî wek cînav tê bikaranîn.

Peyva "pir, pîrr" di kurmanciya navendî, rojavayî û rojhilatî de li kar e lê ew tarîxiyên di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe yan jî nemaye. Ji bilî kurmancî, "pîrr" herwiha di zarên din yên kurdî û zimanên din jî yên îranî de jî peyda dibe. Lê maneya wê di van zar û zimanan de ne wek kurmancî ye lê ew wateya "tijî, tije, mişt, dagirtî" yên kurmancî dide. Ev wateya eslî ya peyvê ye û di kurmancî de wateya wê guheriye.

Rehên peyva "pîrr" heta makezimanê proto-hindûewropî ye û hevrehên wê bi maneya "tijî, mişt, dagirtî" di gelek zimanên hindûewropî de hene: kurmancî, soranî, kurdiya başûrî, zazakî, hewramî "pîrr", farisî "por", belûçî "pur", avestayî "pir-, pirine-", sanskrîtî "purna-, per-", latînî "plenus", yûnanî "poly, plethos", inglîzî "full, fill", almanî "vull"...

Peyva "pîrr" hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînav serbixwe tê bikaranîn. Wek pêşdiyarker ew bê ravek û bê çemandinê tê xebitandin.

- pir kes → pir kesan (ne "*piran kesan" yan "*pira kes" yan "*pirê kes")

Wek cînavê serbixwe ew pirhejmar e û çembar e:

- pir hatin (pir kes hatin)
- piran got (pir kesan got)

Tev

Peyva "tev" wek cînav maneya "hemû, gişt, hemî" dide. Wek daçek "tev" wateya "li gel, pê re, bi ... re" dide.

Di nav zarên kurdî û zimanên îranî de ew tenê di kurmancî de heye û di kurmancî de jî tenê li hin deveran. Di kurmanciya rojhilatî de ew tarîxiyên peyda nabe yan jî nemaye. Herî zêde ew di kurmanciya rojavayî de li kar e lê herwiha di kurmanciya navendî de û di zimanê nivîskî de jî tê bihîstin û dîtîn.

Etîmolojiya peyva “tev” ne bi temamî bêguman e lê du teoriyên xurt bo wê hene. Ew dikare “di hev (de)” be, wek ku “pev” ji “bi hev” û “jev” jî ji “ji hev” e. Lê herwiha ew dikare qusandina yan kurtkirina peyva “teva, tevav” be ku bi eslê xwe ji peyva “temam” ya esil-erebî ne.

Peyva “tev” hem wek cînavê serbixwe û hem jî wek diyarker were bikaranîn. Wek cînavê serbixwe ew dikare bibe mê, nêr û pirhejmar:

- tevan bixwe (tev sêvan bixwe, hemû sêvan bixwe)
- tevê bixwe (tev sêvê bixwe, hemû sêvê bixwe)
- tevî bixwe (tev nanî bixwe, hemû nanî bixwe)

Wek diyarker ew dikare bibe pêşdiyarker (anku bikeve berî peyva raveber) yan jî paşdiyarker (anku bikeve pey peyva raveber):

- tev heval hatin (pêşdiyarker)
- heval tev hatin (paşdiyarker)

Ti, tu, çu, çi

Cînavê “ti” û varyantên wî “tu, çu, çi” maneya “hîç, qet ne tiştê yan kesek jî” didin û di wateyên peyva “her” in.

Di kurmanciya navendî û rojavayî de û herwiha bi serdestî di kurmanciya nivîskî ya bi alfabeya latînî de jî, formên “ti, tu” tên bikaranîn. Di kurmanciya rojhilatî de formên serdest “çu, çi” ne. Li derveyî kurmancî, di zarên din yê kurdî de û di zimanên din yê îranî de ev cînav bi vê wateyê nayê dîtîn. Di soranî û farisî de li cihê wê peyva “hîç” tê xebitandin.

Ji aliyê etîmolojî ve cînavê nediyar “ti, tu, çu, çi” ji cînavê pirsyarkî “çi” peyda bûye û varyantên wê ne. Bo guherîna Ç/T bidin ber peyvên “paçe/pate, qurç/qurt”. Ji aliyê dengnasî ve cînavê nediyar “ti, tu” ji cînavê kesî yê duyem “tu” (di hin devokan “tî”) cuda ye ji ber ku cînavê nediyar bi T-ya bipif (req) lê cînavê kesî bi T-ya bêpif (nerm) tên gotin.

Peyva “tî” û varyantên wê dikarin wek cînavên serbixwe yan jî wek pêşdiyarker bên emilandin:

- Ti nehatin. (“tî” wek cînavê serbixwe)
- Ti kes nehatin. (“tî” wek pêşdiyarker)

“Ti” û guhartoyên wê di hevokên destnîşankirinê (indikativ) de adeten li gel lêkerên neyînî tên xebitandin (li jor “ti [kes] nehatin”) lê di hevokên pirsyarkî de dikarin bi erênî û neyînî werin şuxilandin:

- Ti kes hat?
- Ti kes nehat?

Wek cînavê serbixwe ew dikare bi pirhejmarî biçeme jî:

- Ez tiyan (ti tiştan/kesan) nabînim.

Çemandina yekhejmarî jî xaseten di kurmanciya rojhilatî de bi varyanta “çu” mimkin e:

- Ez çu[y]ê nabînim. (ti keseke/tişteke mê)
- Ez çu[y]î nabînim. (ti kesekî/tiştêkî nêr)
- Ez çu[y]a[n] nabînim. (ti tiştan)

Peyva “ti” û varyantên wê li gel çendîn navdêran hin peyvên nû ava dikin ku carinan bi hev ve lê bi piranî ji hev cuda tên nivîsîn:

- ti car, ticar
- ti der, tider
- ti kes, tikes
- ti gav, tigav

Bo sebebê tercîhkirina nivîsîna ji hev cuda, li beşa li ser peyva “her” li jortir binêrin.

Hinan caran cînavê “ti” (û varyantên wê “tu, çu, çi” ji van peyvên pêkhatî dikevin lê dîsa jî ew heman maneya xwe ya peyva pêkhatî diparêzin:

- ti kes nehat → kes nehat (bi maneya “ti kes nehat, hîç kes nehat, qet kes nehat)

Tişt, tişte

Peyva “tişt” bi eslê xwe navdêr e lê ew herwiha wek cînav jî tê bikaranîn.

Hevreha peyva “tişt” di soranî de “şit”, bi farisî “çîz, çî” û bi zazakî jî “çî” ye. Bo guherîna Ç/T bidin ber cînavê nediyar “ti, tu, çu, çi” li jortir an jî peyvên “paçe/pate, qurç/qurt”. Bo guherîna “-işt” bi “-

î” (kurmancî “tişt” û zazakî û farisiya devkî “çî”) bidin ber cînavê “gişt” û varyanta wî ya devokî “gî” li jortir.

Peyva “tişt” an “tişteş” wek cînavê nediyar kurtkirina “ti tişt, ti tişteş” e. Ew wek cînav adeten di hevokên neyînî de tê xebitandin:

- Tişt(ek) nekir (ti tişteş kir)

Lê carinan di hevokên erênî, bi taybetî yê pirsyarkî de jî peyda dibe:

- Tişteş heye? (Ma/gelo ti tişt heye?)

Wek cînavê serbixwe, peyva “kes” çembar e:

- Tiştî nabînim (ti tiştî nabînim)

Xirr, xirrek (xir, xirek)

Peyva “xirr” (xir) yan jî “xirrek” (xirek) wek cînavê nediyar bi maneya “hemû, hemî, gişt, tev, kull, bitûn” tê bikaranîn. Ew bi vê maneya xwe li hin deverên kurmanciya rojhilatî, bi taybetî li Dihokê li kar e. Li deverên din yê kurmancîaxiv ew bi vê maneyê nayê xebitandin lê wek navdêr bi wateya “endamê cinsî yê nêran” anku “kîr” tê emilandin.

Ji aliyê etîmolojî ve cînavê kurmancî “xirr” hevrehê “xirr” (berhev, li ser hev, komkirî) ya soranî ye. Bi esehî nayê zanîn lê mimkin e ku ew herwiha hevrehên “xeylî, xêlî” (pirr, gelek zehf) yê farisî û zazakî jî bin.

Wek cînavê serbixwe, “xirr” bi mêyîtî, nêrîtî û pirhejmarî diçeme:

- xirrê/xirrekê bîne (hemûyê bîne)
- xirran/xirrekan bibe (hemûyan bibe)

Ji aliyê dengnasî ve kîteya pêşî girankirî ye û “-ek” wek paşgireke çemandinê tê hesabandin (wek “gelek, piçek, hinek/hindek, kêmek) jî û nayê kirpandin/girankirin tevî ku ew bi xwe jî dikare paşgirên çemandinê wergire: xirr-ek-ê, xirr-ek-an.

Wek pêşdiyarker, cînavê “xirr, xirrek” bêyî ravek û çemandinê dikeve berî peyva raveber:

- xirr/xirrek kes → xirr/xirrek kesan (ne “*xirran kesan)

Zehf, zaf

Peyva “zehf” û varyantên wê “zahf, zaf, zav” bi maneya “pirr, gelek, mişe, zor, zêde” ye. Ew wek rengdêr, hoker û cînav di kurdî de tê xebitandin.

Eslê peyvê erebî ضافي (ḍafî) ye. ض (ḍ) anku D-ya “qelew” ya erebî di kurdî de adeten dibe Z. Bo guherîna A bi EH, bidin ber “kanî → kehnî, karik → kehrik”. “Zehf, zaf” hevrehê peyva “îzafe” ye.

Peyva “zehf” an guhartoyeke wê (zahf, zaf, zav) bi berfirehî di hemû devokên kurmancî de û herwiha di zazakî de jî li kar e. Lê di soranî de nayê bikaranîn an jî bikaranîna wê kême.

Wek pêşdiyarker “zehf” û varyantên xwe bêyî ravek û çemandinê dikevin berî peyva raveber:

- zehf tişt → zehf tiştan (ne “*zehfan tiştan”)

Wek cînavê serbixwe, peyva “zehf” û varyantên wê pirhejmar diçemin jî:

- zehf dibêjin (gelek kes dibêjin) → zehfan got (gelek kesan got)

Zêde

Peyva “zêde” maneya “pirtir/gelektir ji ku hewce ye” dide lê bi berfirehbûnê dikare herwiha wateya “gelek, pir” bi xwe jî bide. “Zêde” ji erebî “ziyade” ye ku wek “ziyad” di soranî de jî tê bikaranîn. Li gor hevokê, “zêde” dikare rengdêr, hoker an jî cînav be.

Wek cînav ew dikare serbixwe were xebitandin an jî wek pêşdiyarker were emilandin:

- wek pêşdiyarker: Zêde kes hatin.
- wek cînavê serbixwe: Zêde hatin.

Wek pêşdiyarker ew bêyî çemandin û ravekê tê xebitandin:

- zêde kes → zêde kesan (ne “*zêdeyan kesan” yan “zêdeyên kesan”)

Husein Muhammed: *Cînavên kurdî*

Di gotinên wek “zêdeyî min e” û varyanta wê “zêdeyê min e” de “-yê/-yî” ne ravek in lê daçek in û maneya “bo, jê re” dide: “zêdeyî min e = ji min re zêde ye”.

Wek cînavê serbixwe jî ew adeten nayê çemandin lê çemandina wî mimkin e:

- Zêdeyan got (zêde kesan got – adeten “yên zêde bîne”)

Di vê nimûneyê de jî “zêdeyan” êdî ne cînav lê rengdêrekî navdêrkirî (rengdêrekî bûyî navdêr) e.

Zor

Peyva “zor” bi eslê xwe navdêr e û maneya “tade, kotekî, şidet, hêz, quwet” dide. Ew peyveke îranî ye ku ketiye tirkî jî. Lê di soranî de ew ji navdêriyê vequlipiye rengdêrî, hokerî û cînaviyê û wateya “gelek, pîrr, zehf, zêde” wergirtiye. Di van dehsalên dawiyê de ev bikaranîn ji soranî belavî nav kurmancî jî bûye:

- wek hoker: zor baş (gelek baş, pîr baş)
- wek cînav: zor kes (gelek kes, pîr kes)

Wek cînavê pêşdiyarker ew bêyî ravek û çemandinê tê xebitandin:

- zor kes → zor kesan (ne “*zoran kesan” an “*zorê kesan”)

Wek cînavê serbixwe jî ew zêdetir tenê xwerû û neçemandî tê bikaranîn:

- Zor hatin. (zor kes hatin)

Lê forma wê ya çemandî wek cînav yan nayê bikaranîn an jî bikaranîna wê pîr nadir e:

- ?⁷¹ Zoran got. (Gelekan got. Zor kesan got.)

“Mêrik, lawik, peya, kabra, heval, yaro/yarû, zilam” û hwd.

Ev hemû peyv bi eslê xwe navdêr in. Lê ew dikarin bi awayekî giştîkirî wek cînav jî bînin bikaranîn bi maneya “ew” yan “filan kes”.

⁷¹ Li vê derê mebest ji nîşana pirsyarkî ? ew e ku bi eshî nayê zanîn ka ev awayê gotinê di zimanî de heye yan na.

“Mêrik, heval, peya⁷², zêlam/zilam” zêdetir di kurmançî de, “kabra” pirtir di soranî de û “yarû” jî bêtir di kurdiya başûrî de (li hin deveran wek “yaro” di soranî de jî) tên xebitandin. Eger kesa behbehs jin be, peyvên wek “jinik, hurmet, kulfet/kuflet” bi vê mebestê tên bikaranîn.

Kul(lî), cemîʔ

Ev herdu cînav maneya “hemû, gişt, tev” didin. Ew ji erebî ne lê carinan di kurdî de jî tên xebitandin. “Kul, kullî, kulî” bêyî ravek û cemîʔ adeten bi ravekê ve dibin pêşdiyarker:

- kullî misilman (hemû misilman)
- cemîʔê misilman(an) anku hemû misilman

Adeten ew tenê wek pêşdiyarker tên emilandin û bikaranîn wan wek cînavên serbixwe û çemandî tişteki nadir e.

Bitûn

Peyva “bitûn, butûn, butun” maneya “hemû, gişt” dide. Ew ji tirkî “bütün” hatiye lê hem li Bakurê Kurdistanê di axiftina kurdan de belav bûye û hem jî heta gihiştîye derveyê Bakurê Kurdistanê jî. Bo nimûne, Fêrîkê Ûsiv ji devê lehengekî xwe wiha neqil dike:

"Em: ewledê ana Xezal ruh remetî
- Riza, Meyrem, Hemîd, Huso, Zeytûn, Zekî

Bîr û bitûn bi mal-nefer, bi kurr û qîz

Radimûsin destê xalê xwe yî ezîz..."⁷³

"Bîr û bitûn" kurdîkirina "bir ve bütün" anku "yek [bi yek] û hemû" ya gotina tirkî ye.

"Bitûn" hem wek pêşdiyarker û hem jî wek cînavê serbixwe tê bikaranîn. Wek pêşdiyarker ew dikare li gel ravekê yan jî bêyî wê were istimalkirin:

⁷² Li vê derê mebest jê peyva "peya" ya bi P-ya bipif (req) û zirav e ku maneya "mêrik, zilam, , ne" peya

⁷³ Binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2016/07/22/ferike-usiv-helbesten-bijare/> r. 318.

Husein Muhammed: *Cînavên kurdî*

- bitûn dinya dizane ku...
- bitûnê dinyayê dinyayê dizane ku...

Wek cînavê serbixwe ew adeten neçemandî tê xebitandin:

- Bitûn dibêjin. (hemû dibêjin)

Bikaranîna formên çemandî mimkin e lê nadir e:

- Bitûnan wisa go[t]. (hemûyan wisa got.)

Gêndî

Cînavê din jî yê ji tirkî hatî "gêndî" maneya "xwe, bi xwe" dide. Ew ji tirkî "kendi" yan jî hê deqîqtir ji tirkîya devokî "gendi, gendü" hatiye ku maneya "xwe, bi xwe" dide. Ev cînav li gelek deverên kurmanciya rojavayî, bi piranî li Bakurê Kurdistanê lê herwiha bo nimûne li Rojavayê Kurdistanê jî li devera Efrînê li kar e.⁷⁴

Cînavê "gêndî" jî di kurdî de wek hevwatera xwe ya xwemalî "xwe" ya kurmancî neçemandî tê bikaranîn.

13. CÎNAVÊN DÎROKÎ

Di hejmareke peyvên kurdî de şopa hin cînavên dîrokî anku tarîxî hene ku êdî wek cînavên serbixwe di kurdî de peyda nabin. Bo fehmkirina meseleyê kerem bikin em li van peyvan binêrin:

- îro, îsal, îşev
- hingê, hind, hindî, hingî

⁷⁴ "Birano, peyva 'gêndî' weke we gotî ji 'kendi' ya tirkî hatiye û heta berî çel pênî salî li Efrînê kêma bû dûre ji aliya Tirkî hêdî hêdî belav bû û ket şûn cînava 'wî' de di hin deran de... — (Azad Ekkas, ji Efrînê, di koma "Zimanê Kurdî" ya li ser Facebookê de, 1/2012) – Em jî gêndî bi kar tînin. Ew gêndî di tirkî de wekî kendi ye. — (Kesek bi bernavê Gundê Qaşan di heman komê de).

Cînavê pêşgir î-

Pêşgira î- di peyvên wek “îro, îsal, îşev” de bi zelaî maneya “ev” yan “vê” dide:

- îsal = ev sal; vê salê
- îro = ev roj; vê rojê
- îşev = ev şev; vê şevê

Ev cînavê dîrokî hevrehê “îm-“ ya soranî û “im-, êm-“ ya farisî ye û di soranî de cînavê serbixwe bi forma “em” (bi maneya “ev” ya kurmancî) û di farisî de jî bi şiklê “în” (dîsa bi wateya “ev” ya kurmancî) peyda dibe.

Di devokên kurmancî de “î-“ dikare ji bilî awayê xwe yê serdest û standard “î-“ herwiha bi şiklê “i-“ (kurmanciya rojhilatî) yan jî “hi-“ (kurmanciya rojavayî) be. Di kurmanciya rojhilatî de ew di peyva “îro, iroke” de heye ku varyanteke peyva “evro” (îro) ya di kurmanciya rojhilatî de serdest e. Di kurmanciya rojavayî de ew dîsa li gel peyva “ro(j)” bi şiklê “hiro” tê xebitandin. Lê bikaranîna heman cînavê pêşgir di peyvên din yê nimûne de di kurmanciya rojhilatî de peyda nabe anku mirov nabêje “*îsal, *îşev” lê “ev sale; vê salê” û “ev şeve; vê şevê”. Tenê di kurmanciya navendî û bakurî de bikaranîna pêşgira “î-“ li gel hejmareke peyvên demî (îro, îşev, îsal) mimkin e.

Cînavê pêşgir hi-

Ji peyvên “hingê” (wê demê) û “hind” (ewqas) diyar e ku pêşgira “hi-“ li şûna cînavê “ew, wê, wî” tê bikaranîn. Li şûna “hi-“, ew di hin devokan de di hin peyvan de ew dikare bi awayê “hî-“ be, bo nimûne di kurmanciya rojhilatî de di peyva “hîngê” (wê demê) de. Lê di heman devokan de dîsa jî peyva “hind” (ewqas) heye ku bi “hi-“ ye, ne bi “hî-“.

Dîsa peyva “hinde” heye ku maneya “evqas, bi qasî vî/vê” dide. Ji vê peyvê diyar dibe ku “hi-“ yan “hî-“ ne tenê bi maneya “ew, wê, wî” lê herwiha bi wateya “ev, vê, vî” ye jî.

Dîsa ji peyvên “hin-gê, hin-d, hin-de” diyar e ku mimkin e ku eslê peyvê ne “hi-“ lê “hin-“ yan “hîn-“ bû.

Di farisî de hevrehê wê “în” e. Bo zêdebûna H di kurdî de li destpêka peyvan, bidin ber kurmancî “hesp, hesin/asin, hêsan, hêsir” lê farisî “esb, asin, asan, esr”.

Anku mimkin e ku eslê peyvê maneya “ev” dabe û paşî wateya “ew” wergirtibe yan jî ji destpêkê ve peyveke cotwateyî be.

14. “JÊ, LÊ, PÊ, TÊ” WEK CÎNAV?

Di peyvên “jê” (ji wê/wî/wan), “lê” (li wê/wî/wan), “pê” (bi wê/wî/wan) û “tê” (di wê/wî/wan ... [de]) hem daçek (ji, li, bi, di) û hem jî cînav (wê, wî, wan) hene.

Di rêzimannivîsîna zazakî de gelek caran peyvên wiha wek cînav hatine qal- û qebûlîkirin.⁷⁵ Lê di rêzimannivîsîna kurmancî û soranî de hem ji aliyê kurdan ve û hem jî ji hêla zimannasên biyanî ve jî ev wek daçek hatine qebûlîkirin. Me jî berî niha li gel daçekan peyvên wiha rave kirine. Loma li vê derê em ê wan dubare nekin lê berê xwandevanên hêja bi ruxseta wan bidin wê vekolîna xwe.

15. PEYVRÊZIYA CÎNAVAN

Di komikên de cînav adeten berî navdêran tên:

- ew kes
- wê rojê
- çend caran
- her dem

Herwiha eger di komikê de rengdêr (û hoker) hebin, cînav berî wan jî tê:

- ew kesa qenc (cînav + navdêr + rengdêr)
- wê roja gelek xweş (cînav + navdêr + hoker + rengdêr)

Lê di doxa (halê) xwedîtiyê de cînav dikeve dikeve dûv navdêrê gava ku cînav xwedî (xudan) be:

- kitêba te

⁷⁵ Bo nimûne Roşan Lezgîn di kitêba xwe “Gramera Kirdkî” ya bi kurmancî de û Selcan Zülfü jî di “Grammatik der Zaza-Sprache” (Rêzimana zimanê zazakî) ya bi almanî de peyvên wiha wek cînav didin nasîn.

- birayê wî
- çîrokên wan

Lê hînge jî cînav berî rengdêr û hokeran tê:

- birayê wî yê mezin (navdêr + cînav + ravek + rengdêr)
- kitêba te ya gelek kevn (navdêr + cînav + ravek + hoker + rengdêr)

Cînavê **din** û varyantên wî yên devokî *dî, di, dinê, dîtir, dîtirê* û herwiha hevwaterên wî yên soranî *dî, dîke, tir* û hevwatera wan ya zazakî *bîn* herdem li pey cînava raveber tî anku “din” û varyantên xwe paşdiyarker in:

- şeva din, hevalê din, bajarên din... (bidin ber “wê şevê, wî hevalî, wan bajarên”)

Wek ku tê dîtîn, cînavê “din” bi alîkariya ravekan (-a, -ê, -ên) bi peyva berî xwe ve tê girêdan. Di peyva “cardin, cardî” (dîsa) de ravek (û paşgira nediyariyê “-ek” jî) nehatine bikaranîn an ji ber bikaranîna pirr ya peyvê, ravek û paşgira nediyariyê bo sivikirinê hatine avêtin.

Berevajî “din” û varyantên wê yên din yên kurdî-îranî, hevwatera wê ya ji tirkî wergirtî “başqe” ne paşdiyarker lê pêşdiyarker e anku ew dikeve berî peyva raveber:

- başqe tişt (“tiştên din” yan “tiştên din”)
- başqe kesek (kesekî/keseke din)

Hin cînav jî dikarin hem pêşdiyarker û hem jî paşdiyarker bin:

- hemû, gişt, tev, kul, cemî, bitûn

Wek ku tê dîtîn, ew hemû hevwater ne. Wek pêşdiyarker û wek paşdiyarker jî ew eynî maneyê didin anku raguhastina cihê wan watera wan naguherîne.

- Hemû heval hatin – heval hemû hatin.
- Gişt dinya dinya – dinya gişt dizane.

Ew ne wek pêşdiyarker ew naçemin lê wek paşdiyarker dikarin biçemin:

- Hemû heval dibêjin → *hemû* hevalan got.
- Heval hemû dibêjin → hevalan *hemûyan* got.

16. PIRHEJMARKIRINA DUBARE YA CÎNAVAN

Li gor qeyd û bendên giştî yên kurmancî, navdêr di halê xwerû de bi yekhejmarî û pirhejmarî eynî ne. Bo nimûne, kerem bikin li van herdu hevokan binêrin:

- Heval dibêje.
- Heval dibêjin.

Em dizanin ku di hevoka jorîn (heval dibêje) de "heval" yekhejmar e anku kesek bi tenê ye lê di hevoka jêrîn (heval dibêjin) de pirhejmar e anku du yan zêdetir kes in lê ne tenê yek kes e. Lê peyva "heval" bi eynî şiklî ye, tenê peyvên "dibêje/dibêjin". Ji ber ku yekhejmarî yan pirhejmarî bi xwe ji lêkerê (dibêje/dibêjin) diyar e, ne hewce ye (û di kurdî de nabe) ku pirhejmarî li peyva "heval" jî were barkirin û diyarkirin.

Eger em vê nimûneyê wergerînin çend zimanên din, em ê bibînin ku di vê meselê de gelek ziman ji kurmancî cuda ne:

ziman	yekhejmar	pirhejmar
kurmancî	heval dibêje	dibêjin
inglîzî	the friend says	the friends say
fransî	l'ami dit	les amis disent
tirkî	arkadaş diyor	arkadaşlar diyor(lar)

Wek ku tê dîtin, kurmancî bi tenê cudahiyekê yekhejmarî û pirhejmarîyê ji hev ferq dike: "dibêje/dibêjin". Wek din peyva "heval" di herdu hevokan de eynî ye.

Di inglîzî de hejmara rêzimanî bi du cudahiyan tê kirin: di hevoka yekhejmar de "friend" heye û di ya pirhejmar de "friends" anku S li dawiyê ye. Herçi lêker e, ew, berevajî navdêrê, di yekhejmarîyê de S li dawiya wê heye lê di pirhejmarê de na. "The" ya ku di herdu hevokan de wek hev e, pirtika (article) diyariyê ye anku diyar dike ku tê zanîn ka mebest kîjan heval e yan kîjan heval in.

Eger em niha jî li hevokên fransî binêrin, em ê bibînin ku ti ji her sê peyvên du hevokan ne tam wek hev in: l'/les, ami/amis (heval), dit/disent (dibêje/dibêjin). "L'/les" hevwateriyên "the" ya inglîzî ne anku pirtikên diyariyê ne.

Di tirkî de hevoka yekhejmar "o diyor" e lê hevoka pirhejmar dikare "arkadaşlar diyor" an jî onlar diyorlar" be. Di "arkadaşlar diyor" de cudahiya yekhejmarî û pirhejmariyê tenê bi peyva "arkadaş / arkadaşlar" e lê di hevoka "arkadaşlar diyorlar" da herdu pey bi paşgira "-lar" ji hevoka yekhejmar tên cudakirin. Çawa be jî, ya tirkî ji ya kurmancî cuda ye ji ber ku di tirkî de hevwatera peyva kurdî "heval" her diguhere lê hevwatera peyvên "dibêje/dibêjin" dikare biguhere yan jî eynî be.

Tiştê li vê derê ji me re giring ew e ku navdêr di halê xwerû de di kurmancî de li gor yekhejmarî û pirhejmariyê naguherin lê ferqkirina hejmara rêzimanî (yekhejmar an pirhejmar) bi lêkerê ye (di nimûneyên me dayî de "dibêje" û "dibêjin").

Ev ferqkirina hejmara rêzimanî di cînavan de jî bi awayekî berfireh wek di navdêran de ye. Piraniya cînavan di rewşa xwerû de li gor yekhejmar û pirhejmarê naguherin:

- ew dibêje – ew dibêjin
- bi xwe hat – bi xwe hatin

Lê wek ku me li pêştir di behskirina cudahiyên navbera navdêr û cînavan de kiriye, di hin cînavan de di halê xwerû de jî hejmara rêzimanî diyar dibe:

- yekhejmar: ez, tu
- pirhejmar: em, hûn

Berevajî "ez/min" û "tu/hûn", kurmanciya standard û di hevokan de jî bi piranî kurmanciya rojhilatî û ya navendî cînavê sêyem "ew" di halê xwerû de li gor hejmara rêzimanî naguherînin. Ferqkirin tenê bi lêkerê ye:

- ew hat – ew hatin

Lê di hemû devokên kurmancî de rewş ne wisa ye. Di hin devokan de (bi taybetî kurmanciya rojavayî û bakurî) hejmara rêzimanî hem bi lêkerê û hem jî bi cînavî tê diyarkirin, bi gotineke din, ew hejmara rêzimanî tê dubarekirin. Wek forma pirhejmar ya neçemandî ev devok cînavê "wan" yan "ewan" dixebitînin ku di kurmanciya rojhilatî û navendî de formên çemandî yên pirhejmar yên cînavê "ew" in.

Heman cudakirina dubare ya ferqa hejmara rêzimanî di soranî, kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) û zazakî de jî heye:

zar ⁷⁶	yekhejmar	pirhejmar
kurmanciya rojhilatî, kurmanciya navendî û kurmanciya standard	ew hat	ew hatin
hin devokên kurmanciya rojawayî û kurmanciya bakurî	ew hat	wan hatin, ewan hatin
soranî	ew hat	ewan hatin
kurdiya başûrî	ew yat	ewane yatin
zazakî	o ame ⁷⁷	ê ameyî

Hin devokên kurmancî – bi taybetî yên rojavayî û bakurî – ne tenê cînavê pirhejmar yê çemandî (wan, ewan, wa) gelek caran li cihê forma neçemandî (ew) dixebitînin lê heman cînavî bi ducarî jî pirhejmar dikin:

- ew → ewan, ewan, wa → ewana[n], wana[n]

Ew heta van formên dubare pirhejmarkirî û çemandî jî carinan li cihê forma neçemandî ya pirhejmar ya kurmanciya rojhilatî û navendî û zimanê nivîskî diemilînin:

- rojhilatî, navendî, standard: ew hatin
- rojavayî, bakurî: wan hatin, ewan hatin, wana hatin, ewana hatin

Heman tişt li cînavê destnîşankirinê "ev" jî tê kirin:

lehce	yekhejmar	pirhejmar
-------	-----------	-----------

⁷⁶ Ji bilî kurmancî, ji zarên din (soranî, başûrî, zazakî) ji her yekê tenê nimûneyek hatiye dan daku diyar bibe ka mesele di wan lehceyan de çawa ye. Bo dirêjnekirina meseleyê, me varyantên devokî ji wan lehceyan nedane.

⁷⁷ "O ame" forma nêr e. Forma mê "a ameye" ye. Berevajî kurmancî, zazakî di halê xwerû de jî navdêr û cînavê sêyem bi cînsê wan yê rêzimanî jî ji hev cuda dike.

kurmanciya rojhilatî, kurmanciya navendî û kurmanciya standard	ev(e) ⁷⁸ hat	ev(e) hatin
hin devokên kurmanciya rojawayî û kurmanciya bakurî	va ⁷⁹ hat	van hatin, evan hatin, vana hatin, evana hatin
soranî	eme hat	emane hatin
kurdiya başûrî	(e)ye yat	yane yatin
zazakî	no ame	nê ameyî

17. AVÊTINA CÎNAVAN

Di gelek rewş û haletan de di hevokên kurdî de bikaranîna cînavan tiştêkî ixtiyarî anku dilxwazî ye. Bi gotineke din: bikaranîna cînavan di her hevokê de ne zerûrî ye, bêyî cînavan jî di hin rewşan de diyar e ka mebest kîjan cînav e.

Kerem bikin em li çend nimûneyan binêrin:

- Ez hatim.
- Tu çî dibêjî?
- Ew ne kurd e.

Ji van hevokan em bi xêra "ez, tu, ew" dizanin ka mebest jê kî ye. Lê dîsa jî em dikarin cînavan ji van hevokan biavêjin:

- Hatim.
- Çî dibêjî.
- Ne kurd e.

Dîsa jî em fehm dikin ku kesê hat "ez" im, kesê dibêje "tu" yî û kesa/kesê ne kurd jî "ew" e.

Sebebê imkana avêtina an jêxistina cînavan ew e ku di nimûneyên me dayî de ne tenê cînav lê herwiha paşgirên kesî yên lêkeran jî diyar dikin ka mebest jê kîjan cînav e:

⁷⁸ "Eve" forma kurmanciya rojhilatî ye.

⁷⁹ "Va" li vê derê kurtkirina "eva han" e.

- **hatim** (= ez)
- **dibêjî** (= tu)
- **ne kurd e** (= ew)

Lê avêtina cînavan herdem ne mimkin e. Kerem bikin em li çend nimûneyan binêrin:

- min got
- te got
- wî got
- me got
- we got
- wan got

Ji ber ku peyva "got" bi tenê diyar nake ka kê got, ne mimkin e ku mirov ji hevoka "min got" cînavê "min" biavêje û dîsa peyva "got" bi maneya "min got" fehm bike. Loma kesê tiştê gotî eger "min, tu, me, we" be, hingê bikaranîna cînavî di vê haletê de zerûrî ye:

Lê dîsa jî peyva "got" dikare bi tenê bêyî cînavên "wê/wî/wan" were bikaranîn û bi maneya cînavê sêyem were fehmkirin. Anku mimkin e mirov "wî got" yan "wê got" yan jî "wan got" kurt bike û tenê bibêje "got".

Bi gotineke din, eger ti paşgirên kesî bi lêkerên gerguhêz (transîtîv) yê di dema borî de ve tine bin, ew wisa tê fehmkirin ku biker anku kesê tiştê kiriye "wê, wî, wan" in:

- xwar (wê/wî/wan xwar – kesek yan çend kes, jin an mêr)

Eger ti paşgirên bi lêkerên negerguhêz (intransîtîv) ve tine be, hin biker wek kesê sêyem yê yekhejmar tê fehmkirin:

- hat = ew hat (kesek bi tenê – jin an mêr)

Di rastiye de ji hevoka "min got", "te got", "wî got"... ji xwe cînavê "ew" hatiye avêtin:

- min got = min ew (tişt) got

Anku peyva "got" dibe bedelî "wî ew (tişt) got" yan "wê ew (tişt) got" yan "wan ew (tişt) got".

Di kurmanciya navendî de û herwiha bi piranî di kurmanciya nivîskî de jî paşgirên kesî yê cînavên pirhejmar wek hev in:

- em **hatin**
- hûn **hatin**
- ew **hatin**

Ji ber vê, avêtina cînavên "em" û "hûn" ne mimkin e anku ne mimkin e mirov li cihê "em hatin" tenê bibêje "hatin" û ev dîsa wek "em hatin" were fehmkirin (bidin ber "ez hatim → hatim" ku dîsa jî tê fehmkirin ku kesê tê ez im). Di rewşên wiha de tenê "ew hatin" dikare bibe "hatin" û dîsa wek "ew hatin" were têgihiştin.

Di kurmanciya rojhilatî de û herwiha di soranî de jî paşgirê yê cînavê "em" ne wek yê cînavên "hûn" û "ew" ya pirhejmar "-in, -n" e lê "-în, yn" e:

kurmanciya navendî	kurmanciya rojhilatî	soranî
em <i>hatin</i>	em hatîn	ême hatîn
hûn <i>hatin</i>	hûn <i>hatin</i>	êwe <i>hatin</i>
ew <i>hatin</i>	ew <i>hatin</i>	ewan <i>hatin</i>

Ji ber vê, di kurmanciya navendî de ne mimkin e ku mirov "hatin" tenê bi wateya "em hatin" yan "hûn hatin" bixebitîne. Lê di kurmanciya rojhilatî de û di soranî de "hat**în**" bi "-în" (ne bi "-in") li gel cînavê "em" tê bikaranîn, mimkin e û diyardeyeke berbelav e jî ku gotina "hat**în**" bêyî cînavê "em" jî tê emilandin û dîsa jî bi wateya "em hatin" tê fehmkirin.

Carinan gava ku werger ji soranî tê kirin, di zêdekirina cînavê "em" ku di kurmancî de zerûrî û di soranî de gelek caran ixtiyarî ye, tê jibîrkirin, loma hin kêmasiyên wiha derdikevin:

- "Nêçîrvan Barzanî: Bi serkeftina îradeya gelê Tirkiyê dilxweş *in*."⁸⁰

Lê ji vê hevokê bi kurmancî wisa tê fehmkirin ku N. Barzanî gotibe ku hin kesên din dilxweş (kêfxweş) in lê di orijînalê hevokê ya soranî de li cihê "in" ya dawiya hevoka kurmancî "în" heye ku maneya "em ... in" dide anku N. Barzanî gotiye "em bi... dilxweş in" lê ji hevoka kurmancî wisa tê fehmkirin ku wî gotibe "ew bi ... dilxweş in".

⁸⁰ <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/160720162>

Lê di kurmanciya rojhilatî û di soranî de jî mirov nikare "hûn hatin" (bi soranî "êwe hatin") tenê wek "hatin" bi kar bîne. Di wan devok û lehceyan de jî "hatin" bêyî cînav dîsa maneya "ew hatin" tê fehmkirin.

18. KURTKIRINA CÎNAVAN

Diyardeyeke giştî ya kurdî û hemû zimanan e ku peyvên pir tîn bikaranîn meyla kurtbûnê heye anku ber bi kurtbûnê ve ne. Ji ber ku cînav – bi taybetî cînavên kesî – pir tîn bikaranîn, ew kurt dibin.

Ez → e

Cînavê "ez" di axiftinê de di hin rewşan de Z-ya xwe diavêje yan jî wê bi dengê peyva pey xwe ve dihelîne:

- ez jî → ejî
- ez nizamim → e'nizam

Min → mi, -m

Cînavê "min" hem di kurmancî û hem jî di zarên din yên kurdî de di axiftinê dibe "mi":

- Min got → mi go
- Mi dît → mi dî

Cînavê "min" wek paşdiyarker (li pey raveberê) jî hin caran kurt dibe û tenê 'm jê dimîne:

- cana min → cana'm

Tu → ti, t'

Cînavê "tu" gelek caran di piraniya devokên kurmancî de û li hin deveran jî herdem bûye "ti" ku formeke ji eslê xwe "tu" kurttir e:

- Tu çî dibêjî? → Ti çî dibê?

Di axiftina kurmanciya navendî de "tu" gelek caran herwiha bi lêkera alîkar ya dema bê "ê" (dê, wê, yê) ve dihele û bi hev ve dibin "tê":

- Tê çi bikî? (Tu ê çi bikî? Tu dê çi bikî?)

Ewê, ewî, ewan → wê, wî wan

Di kurmanciya nivîskî de û herwiha di piraniya devokên kurmacî de jî niha formên cînavê "ew" yê serdest yê çemandî "wê" (mê), "wî" (nê) û "wan" (pirhejmar) in.

Lê eslê wan "ewê, ewî, ewan" bû û "e" ji destpêka hemûyan ketiye:

- ew+ê → ewê (bidin ber "kitêb+ê" → "kitêbê") → wê
- ew+î → ewî (bidin ber "nan+î" → "nanî") → wî
- ew+an → ewan (bidin ber "kitêb+an" → "kitêban") → wan

Cudahiya formên kurtkirî yê "wê, wî, wan" li gel formên kurtkirî yê "ez, min, tu" ew e ku "wê, wî, wan" êdî di zimanê nivîskî de jî bûne standard û "ewê, ewî, ewan" pir kêma di kurmanciya devkî yan nivîskî de tên bikaranîn.

Em, me

Di hemû devokên kurmacî de tek forma neçemandî ya cînavê yekem yê pirhejmar "em" û forma çemandî jî "me" ye. Bi gotineke din, mirov ti kurtbûn an guherînê di di vî cînavê ji xwe kin de nabîne.

Lê eger mirov "em, me" bide ber hevwateriyên wî yê soranî "ême, -man", mirov dikare bibîne ku kurtbûneke dîrokî di van de jî di kurmacî de peyda bûye.

Hûn, we

Forma çemandî ji cînavê duyem yê pirhejmar di kurmanciya nivîskî de û herwiha di piraniya devokên kurmacî de "we" ye ku ji xwe kurt e û mirov wê êdî kurttir nake. Lê ew di kurmanciya rojhilatî de "hewe" ye û di soranî de jî "êwe" ye. Bi vî mirov dikare bibîne ku kurtbûneke dîrokî di "we" ya niha di kurmacî de serdest çêbûye û vî forma kurtkirî di piraniya devokên kurmacî de ser ji formên din standiyê û wek tek alternatîv maye.

Forma neçemandî ya cînavê duyem yê pirhejmar di kurmancî de li gor devokan pir diguhere. Forma standard û serdest "hûn" e lê herwiha formên wek "hun, win, hün, hîn, hingo" û belkî hin varyantên din jî hebin. Pir kêmbê jî, forma "win" hinekî ji formên din kurttir e anku mirov di vê de jî kurtkirinê hest dike.

19. DUBAREKIRINA CÎNAVAN

Carinan heman cînav di eynî hevokê de tê dubarekirin. Dubarekirina dikare bi mebesta xurtkirinê: bi merema diyarkirina ku kesekî tiştêk bi xwe kiriye, ti kesekî din ew tişt kiriye. Bo nimûne:

- Ez ê bikim, ez. (ne ti kesekî din ji bilî min)
- bi xwe xwe şûşt (ne bi destê ti kesekî din)

Wek ku tê dîtin, mebest jê giringîdana bi bikerî ye. Dubarekirin di piraniya haletan de ne zerûrî ye. Loma mirov dikare nimûneyên li jor wiha jî binivîse:

- Ez ê bikim.
- Xwe kuşt.

Ev jî eynî wateyê didim lê ne wek nimûneyên pêştir xurt in.

Carinan jî dubarebûna cînavê ji neçarî ye. Bo nimûne:

- Birayê min dê min bibe bajêr.

Mirov nikare yek ji van herdu "min"an biavêje bêyî ku wateya wê biguhere.

- "Birayê min dê bibe bajêr" wê maneyê nade ku yê were birin "ez" im.
- "Bira dê min bibe bajêr" wê maneyê nade ku yê min bibe birayê min e.

Bi taybetî jî bikaranîna cînavê "ew" û formên wî yê çemandî di heman hevokê de diyardeyê berbelav e. Gava ku ew tê dubarekirin, adeten mebest jê du kesên ji hev cuda ne:

- Ew wê nas dike. (Ehmed Eysê nas dike.)
- Wan ew dît. (Ehmedî û Hesenî Fatê dît.)

20. KIRPANDINA CÎNAVAN

Mebest ji "kirp" an "kirpandin"ê (bi inglîzî "stress") girankirin, şidandin an dirêjkirina kîteyeke (heceyeke) peyvê ye.

Piraniya cînavên kurmacî ji xwe yekkîteyî ne û ew kîte bi zerûrî kirpandî anku girankirî ye. Hin formên devokî de û herwiha hin cînavên lehceyên din yên kurdî dukîteyî ne û hingê kîteya dawiyê kirpandî ye:

- ji devokên kurmacî: ewê (wê), ewî (wî), ewan, hewe, hingo
- nimûne ji soranî: ême (em), êwe (hûn), ewan
- nimûne ji zazakî: şîma (hûn, we), înan (wan), aye (wê)

Eger ravek an lêker alîkar ya dema bê "ê" li pey hebe, hingê adeten ew bi dengnasî wek beşek ji cînavê tê hesibandin, cînav dibe dukîteyî kirp dikeve ser beşa dawiyê:

- adeten: "ez ê biçim"
- "ew a reben"
- birayê min ê mezin

Lê eger mirov bixwaze bi taybetî giringiyê bide wî kesî û bibêje ku mexsed illeh ew e û ne ti kesê din e, hingê kirp li ser cînavî bi xwe dimîne û ravek yan lêkera alîkar nayên kirpandin:

- "ez ê biçim" (ez, ne ti kesî din)
- ewa reben (ew, ne ti kesî din)
- birayê min ê mezin (birayê min, ne birayê kesekî din)

21. RASTNIVÎSÎNA CÎNAVAN

Di meseleya rastnivîsîna cînavan de du mijar hene:

- Cînav bi xwe çawa anku bi çi herfan tên nivîsîn?

- Kengî cînav ji peyv û peyvîkên pey xwe cuda tên nivîsîn û kengî jî bi wan ve tên zeliqandin?

21.1. Rastnivîsîna cînavan bi xwe

Ji piraniya cînavên kurmacî du yan zêdetir varyant û guharto hene. Li vê derê em ê diyar bikin ka kîjan forma her cînavê kesî serdest û standard e (li gor nivîsên kurmacî – ne li gor qenaeta şexsî ya vekolerê vê mijarê). Pêşî em ê formên neçemandî (netewandî, xwerû) pêşkêş bikin.

cînav (neçemandî)	standard, serdest	formên din
kesê yekem yê yekhejmar	ez	e, wez, es
kesê duyem yê yekhejmar	tu	ti, tû, t'
kesê sêyem yê yekhejmar	ew	-
kesê yekem yê pirhejmar	em	-
kesê duyem yê pirhejmar	hûn	hon, hun, hûn, hwîn, hîn, hingo, win, wun
kesê sêyem yê pirhejmar	ew	ewan, ewana, ewanan, wana, wa

Formên çemandî (tewandî, oblîk) jî wiha ne:

cînav (çemandî)	standard, serdest	formên din
kesê yekem yê yekhejmar	min	mi, 'm
kesê duyem yê yekhejmar	te	-
kesê sêyem yê nêr	wî	ewî
kesa sêyem ya mê	wê	ewê
kesê yekem yê pirhejmar	me	-
kesê duyem yê pirhejmar	we	hewe
kesê sêyem yê pirhejmar	wan	ewan, ewana, ewanan, wana, wa

Ne tenê di cînavên kesî de lê di yên din de jî varyantên nivîsînê hene. Bi taybetî cînavê lêveger "xwe", cînavê beramberiyê "hev" û cînavê nîşandanê "han" xwedî çendîn varyant in. Di kurmancî de rewşa wan wiha ye:

cînav	standard, serdest	varyantên din
cînavê lêveger	xwe	xo, xu, xwi, xe, xa, xwu
cînavê beramberiyê	hev	hevdu, hevdin, hevûdu, hevûdin, yekûdu, yekdî, êkûdu, êkdu
cînavê nîşandanê	han	ha, hanê, he, henê

20.2. Bi hev ve yan ji hev cuda?

Yek ji lihevnekirinên serekî yên rastnivîsîna kurdî li ser wê ye ka kengî bi peyvikên erkî (*function word*) yên pey xwe ve bînin nivîsîn û kengî jî ji wan werin veqetandin:

- "ew kitêba min e" yan "ew kitêba mine"?
- "ez ê biçim" yan "ezê biçim"?
- "ewa han" yan "ew a han"?
- "dayika xwe ya pîr" yan "dayika xweya pîr"?
- "hevalên hev ên qenc" yan "hevalên hevên qenc"?
- "ezî/ezê reben" yan "ez î reben / ez ê reben"?
- "birayê te yê biçûk" yan "birayê teyê biçûk"?
- "mala wan a berê" yan "mala wana berê"?

Cînavên paşdiyarker jê cuda

Cînavên kurmancî û zazakî ji peyva berî xwe cuda tên nivîsîn:

- kitêba min (ne "*kitêbamin")
- birayê te (ne "*birayête")

Ev berevajî soranî, kurdiya başûrî, farisî, tirkî û erebî ye ku cînavên pêvekirî yan paşgirên cînavî hene (hemû bi maneya "serê te"):

- soranî: ser-it
- kurdiya başûrî: ser-id
- farisî: ser-it
- erebî: reis-ek
- tirkî: kafa-n

Di kurmancî de qeyda giştî ew e ku cînav bi peyva berî xwe ve nayên zeliqandin lê hin awarte û istisnayên giring û hinên kêmtir giring jî hene.

Istisnayên giring kurtkirin û zeliqandina cînavên "wê, wî, wan" bi daçekên bingehîn "bi, di, ji, li" ve ye:

- bi wê, bi wî, bi wan → pê
- di wê, di wî, di wan (de) → tê (de)
- ji wê, ji wî, ji wan → jê
- li wê, li wî, li wan → lê

Herwiha istisnayeke giring jî pêvekirina cînavên "wê, wî, wan" bi şiklê "-î" bi dawiya hin navdêran ve:

- serê wî/wê/wan → serî: derbeyek li serî da (li serê wê/wî)

Istisnayeke nadirtir û zêdetir devkî û helbestkî kurtkirin û girêdana cînavê "min" bi peyva berî wê ve ye:

- cana min → canam

Lê cînavên kurtnekirî herdem divê ji peyva berî xwe cuda werin nivîsîn:

- bi te, ji min, li wan, bi xwe, ji xwe, ji wê re, bi te re, li gel wan
- serê min, serê te, serê wê, serê wî, serê me, serê we, serê wan

Kopula herdem jê cuda

Kopula anku formên dema niha yê lêkera "bûn"ê peyvên serbixwe ne û ji hemû peyvên berî xwe cuda tên nivîsîn:

- "Ew kitêbek e" rast e, ne "ew kitêbeke" (bidin ber "ew kitêbek bû", ne "ew kitêbekbû")
- "Ew kitêba min e" rast e, ne "ew kitêba mine" /bidin ber "ew kitêba min bû", ne "ew kitêba min bû")

Peyvikên li dûv cînavên çemandî jê cuda

Eger cînav di halê çemandî de be, hingê peyvikên pey wî pê ve nayên girêdan:

- birayê *te yê* mezin (ne "*birayê *teyê* mezin", bidin ber "birayê Hesenî yê mezin", ne "birayê Hesenîyê mezin")
- du hevalên *min (y)ên* baş (ne "du hevalên *minên* baş, bidin ber "du hevalên Fatê yê baş", ne "xwişka Fatêya baş")
- xwişka *wî ya* mezin (ne "xwişka *wîya/wiya* mezin", bidin ber "xwişka Azadî ya baş", ne "xwişka Azadîya baş")

Eger formên çemandî û neçemandî yê cînavî eynî bin, hingê dîsa cînav ji peyvika pey xwe cuda tê nivîsîn eger cînavên xwedî du formên cuda yê çemandî û neçemandî di eynî rewşê de ji peyvika pey xwe cuda werin nivîsîn:

- hevalên *hev (y)ên* baş (ne "hevalên *hevên* baş" – bidin ber "hevalên min ên baş", ne "hevalên minên baş")
- birayê xwe yê mezin (ne "birayê *xweyê* mezin" – bidin ber "birayê *te yê* mezin", ne "birayê *teyê* mezin")

Lêkera alîkar "ê" ya dema bê jê cuda

Dema bê di kurmacî de bi lêkereke alîkar tê çêkirin ku forma wê ya kurtkirî "ê" ye, wek din li gor devokan dikare "dê", "wê" yan "yê" be:

- tu ê bikî
- tu dê bikî
- tu wê bikî

Husein Muhammed: *Cînavên kurdî*

- tu yê bikî

Gava ku formên "dê" û "wê" tên bikaranîn, piraniya nivîserên kurmancî ti pirsgirêk di rastnivîsînê de nabe: ew vê peyvikê ji cînavê berî wê cuda dinivîsin:

- tu dê bikî (ne "*tudê bikî")
- tu wê bikî (ne "*tuwê bikî")

Lê gava ku forma "ê" yan "yê" tê xebitandin, hin kes wê bi ji cînavê berî wê cuda dinivîsin û hin jî pê ve dizeliqînin:

- ez ê bikim, tu yê bikî
- ezê bikim, tuyê bikî

Lê lêkera alîkar ya dema bê (ê, dê, wê, yê) peyveke serbixwe ye û divê ji cînavê berî xwe cuda were nivîsîn:

- ez ê bikim (wek "ez dê bikim, ez wê bikim", ne "*ezdê bikim, *ezwê bikim")
- tu (y)ê bikî (wek "tu dê bikî, tu wê bikî", ne "*tudê bikî, *tuwê bikî")

Ravek bi cînavên neçemandî ve

Di kurmancî de ravek (izafe) bi navdêrên neçemandî ve tên nivîsîn:

- keça kurd, kurê kurd, gelê kurd
- jina reben, mêrê reben, mirovên reben
- hevala hêja, hevalê hêja, hevalên hêja

Bi heman awayî ravek bi cînavên neçemandî ve jî tên zeliqandin:

- ewa kurd, ewê kurd
- eza reben (jin), ezê/ezî reben (mêr), emên reben (pirhejmar)
- tuyê hêja, hûnên hêja